

R

ayedarêن


dewleta tirk du salan amadekariya HABITAT II kîrin. Vê civînê di 3'ye pûşperê de dest pê kir. Berî civînê, dewletê bi milyaran pere li rê û peyariyên Stenbolê xerc kir, seg û pisik dan kuştin û zarokên bêxwedî derxistin deriveyî bajêr. Her wiha çalakiyên rêxistinê demokratik qedexe kirin. Diviyabû her tişt bi dilê mêvanan bûya. Lewre wan ji bo xatirê mazûban prensibên xwe dabûn bin piyan. Lê rêxistinê dijber jî bi çalakiyên cur bi cur dan zanîn ku mazûban di warê xerakirina malên mirovan de êdî jêhatî ye û heta niha 150 hezar malên kurdan wêran kiriye.

Râpel 3



- ✓ Gerînendeyê Weşanê yê rojnameya hefteyî Agosê Hîrant Dink bi AYNUR BOZKURT re peyivî û der barê înkarkirina qetliama ermenan de wiha got: 'Ew ci bager bû gelê me belawela kir!' Râpel 8-9
- ✓ Edip Karahan, welatparêzê bi nav û nîşan bû, OSMAN ÖZÇELİK bi sernavê "Mêrê çê" wî bi bir tîne Râpel 4-5
- ✓ "Bûyera 60 sal berê hê jî zindî ye", parçeyek ji dîroka me ya devkî ji Rabia Doğela(70).

NAVEROK



6

Louis Claire: Li hemberî kurdan edaleta Îngilistanê



10

S. Robarî: Pêla evînê Hamid Bedirxan



13

M. Ronak:
Hades tim li ser kar in

Ji Xwendevanan

GELO NIZANIM, gelê me li welatê xwe geriyane an, na! Bi rastî ez bersîva vê pirsê zehf meraq dikim. Wê rojê em, çend xwendevanenê zanîngehê çûn dîtina bajarê kevin, Heskîfê.

Ji wir em çûn ber bi Kercews, Nisêbin û Midyadê. È birano qey ez dikarim bi pénûsê, pesnê xweşîya wan deveran, tabiat û dirokibûna wan bidim? Tişte min got, ev bû: "Gidîno temamê welêt li vî rexî ye!" Hema dikarim bêjîm ku di vê biharê de kîjan mirovê vî gelê ji hev parçebûyi, biçe dîtina wan deveran, ewê bibe welatparêz û belki bibe mezopotamyaperest ji.

Bi vê munasebetê, hê ez tegihîstîm ku, me ne xwe, ne gelê xwe, ne diroka xwe û ne ji nîstimana xwe nas kiriye.

Gelo ci siûdeke mein e ku mirov li seranserê welat bigere di biharê de... Xweşîya Munzûrê, Agîrî, Wanê, Torê, Botan, Xerzan û Nemrûdê bi tenê hêjayî pesndanê ye. Lê ka îca xweşîya rojhîlatê welat, başûrê wî...

Xebatkarên Azadiya Welat hûn bi xatir û qedrê welatê rengîn bikin, çawa hûn cih didin diroka zérîn, her wiha ji, cih bidin cografyaya Kurdistânê.

BEKIRXAN REBETİ
AMED



Bajarê hindikahiyan Stenbol

MEHMET GEMSİZ

Gotinek heye di nav tirkan de, wiha ye: Li Stenbolê 72 milet û nîv dijîn. Mebest ji vê gotinê ev e: Gelek qewm li Stenbolê hene û Stenbol ne bajarekî homojen e. Qesta ji "nîv" ji cengene, gewende ne. Ew tam milet na-yêne hesibandin. Ev ji qedera wan e.

Hevpeyîna bi Gerînendeyê Weşanê yê Agosê re, ev gotina li jorê û rewşa "hindikahîyên ne-misilman" ên li Stenbolê anî bîra min. Çima Stenbol? Ji ber ku hindikahî (ekkaliyet, mînorîte) pir-tir lê dijîn.

Bi rastî ji Stenbol, hemen hemen, tu car ji gelekî re, ji qewmekî re nebûye war. Ji aliye çand, ol, qewman ve zengîn bûye. Rûm, cihû, ermen, tirk, arnawid, kurd, çerkez, laz, û hwd. mora xwe li vî bajarê dêrin û kevnare dane.

Nemaze ev bajar, ji bo gayrî-muslîman tim cihekî ewledar bûye. Heta em

dikarin bibêjin ku stareya wan bûye. Ev bajar qet ji ber çavê rojavahîyan neçûye û di bin çavdêriya wan de bûye. Lewma ji cihû, ermen û rûman bi taybetî xwe lê girtine. Ji ber ku ewletiya mal û canêwan li bajarê Anadolê tune bûye.

Çi dema ku dewleta tirk bixwaze, dikare bi riyêne nependî û nerasterê, bobelatan bîne serê wan. Bûyerên 6 û 7'ê rezberê hê ji teze ye di hiş û bîra rûman de, ku li Stenbolê çawa talan û tajan bûn.

ermen ji tim bixter û endîse dijîn. Ji bo tirkan ew ji dijimin û neyarêne kevnare ne. Jixwe di binê her kevirî û di her qulê de ew hene ji bo tirkan. Wekî ser û sebebîn xerabiyen têne dîtin. Çi dema yekî tirk ji yê din bienite an lê hêrs dibe, çêra wî ev e "ulan ermeni tohumu" ku ev çera herî sivik e.

Jixwe hemû PKK'yî, kurd ji bo wan ermen in û ew dixwazin dewleta dawîn a

tirkan ji bipelêşin.

Di nav ermen, rûm û cihûyan de, yênerî bişans cihû ne. Navbera wan û dewleta tirk zehf rind e. Hevalbendê hev in. Ne tenê cihûyên li Stenbolê, Îsraîl ji ji ber-re ve li pişta Tirkîyeyê ye. Ew piştevanen hev in.

Peymana leşkerî ya di navbera Tirkîye û Îsraîlê de ku meha çûyî hatibûn morkirin, careke din vê hevalbendiya li diji gelan dipeyitîne (îspat dike).

Heyeteke leşkerî ya Îsraîlê di 4'ê pûşperê de hate Tirkîyeyê. Serokê Heyeta Leşkerî yê Îsraîlê û Cîgirê Serkanê Giştî (serleskerî) yê Îsraîlê Mutan Vilani, bi Or-general Çevik Bir re hevditinek pêk anî.

Serokê Duyemîn ê Serkaniya Giştî ya Leşkerî Çevik Bir daxuyand ku wê balafîren Îsraîlê sînorêne Tirkîyeyê biparêzin û ji bo têkoşîna bi PKK'ê re, ewê ji teknolojiya Îsraîlê istîfade bikin.

Tişte girîng ev e ku naveroka peymanê nayê eşkerekirin û veşarî dihêlin. Heta tê gotin ku rayedarêne sivîl ên tirk ji, ji naverokê bêhay in.

Ji bo dewletê, rûm û ermen neyar û cihû ji dost û hevalbend in.

Bila dostê wan li wan pîroz be!

Taybetiyên kurdê metropolan

Mirovê ku welatê xwe biterikîne, bêreh dimîne.
Giyayê ku hatibe çinîn çawa zû hiş dibe, mirovê ku ji welatê xwe, ji rehê xwe yê neteweyî qut bibe,
ew ji zû hiş dibe.
Kurdîti û neteweyî pişti demekê namîne.

ALAATTİN AKTAŞ

zanibin li der û dora xwe eşkere dikin. Bi van têkiliyan bi partiyê re, pesnê şexsê xwe didin. Li zerar û ziyanâ ku bigihîje têkoşînê ew qasî nafikirin û ew qasî ji xwe re nakin xem ji.

Peywirê (wezifeyen) welatparêziyê biçûk û pir teng dibînin, hewandina çend kesan li malê, dayîna hinek xwarin û diravan ji welatparêziyê re bes dibînin.

Xwişk û birayêne nav naşîn nav refîn artêşê û ew bi xwe ji zû bi zû naçin. Ger yek ji mala wan çûbe, ew vê yekê dikin minet, ji xwe re payeyan dixwazin. Wexta ku cihek, malek jê tê xwes-tin, bi piranî malen xerîban nîşan didin. Ger xwedî kar û meas bin, qet naxwazin kes here mala wan, ew bi xwe ne-wîn bikevin nav têkiliyan. Ji destder-ketina meaşê xwe ditirsin.

Ji şandina zarokên xerîban re, pir jê-hatî ne. Ku hinek zarokên xwe naşîn şer û wan dizewicînin, agir li wan dibâ-

rînin. Lî belê ew zarokên xwe "diparêzin", dizewicînin û ji têkoşînê dûr dîkin. Wan bi hêsanî dişîn leşkeriya dijimin.

Wexta ku dijimin wan digire û işkencîcîyê li wan dike, tişten der zanibe zû eşkere dike, têkiliyan, mirovan, nav û malen welatparêzan, cihê malzemeyan pir bi hêsanî teslimî dijimin dike.

Wexta ku têr girtin, li tevgera partiye pir hêrs dîbin. Li kemasîyen xwe na-fikirin; partiyê sedemî girtina xwe dibînin.

Di zîndanê de xwe ji bo wezifeyen şoreşgerî û welatparêziyê yêne mezin, hazır û amade nakin, dixwazin wexte xwe bi xewê, bi lîstik û temasîkirina televîzyonê bîborînîn. Ji xwendinê, ji civîn û axaftina siyasi zû aciz dîbin. Gelek caran di xwendin û civînan de radîzin.

Xema wan ne fîrbûn e, roj li gorî kêfa wan derbas bibe, bes e ji wan re. Wexta ku têr cem hev û di têkiliyan de, behsa têkoşînê û welat nakin. Ew bi pîranî li ser mal, kar û zarokên xwe diaxîvin. Ji ber ku mal û malbata wan li Tirkîyeyê ye, berjewendiyen xwe zêdetir di Tirkîyeyê de dibînin.


Em dixwazin welatparêzen me û he-mû mirovîn kurd xwe bi bawerî û fik-rîn neteweyî bişidîn û dilê xwe bi evîna welat tije bikin. Ji bo vê yekê ji, pîwist e mirov hemû insanen xwe ji nêzîk ve nas bike, kemasîyen wan bas tesbît bike, da ku mirov karîbe wan li gorî berjewendiyen şoreş biguherîne.

Hinek mirovîn me yêni li metropolan bi van xisûsiyet û bi vê şexsîyetê, bi tevgera azadiyê re dikevin têkiliyan. Ew mirovîn me, di nav têkoşînê de ji zû bi zû nabin yek, belavbûyi dimînin; ji dîsîplînê direvin; xebat û têkiliyan sist dikin.

Ew zimanê xwe nagirin, têkiliyan ku

LEŞKER ROJA 1'ê pûşperê diçin Culemêrgê, gundê Bayê. Li gundiyan işkenceyê dîkin, pîsiya heywanan bi wan didine xwarin ku çima nan dane gerîla. Lî kesen ku xwe wekî gerîla dane naskirin leşker bûne. Ji ber işkenceyê Sedika Baytar (80) dimire. Lingê Cafer Çiftçi jî tê şikandin, ji Malbatan Baytaran 19 kes û ji malbatan Çiftçyan jî 22 kes tê binçavkirin.

Ev ne cara pêşin e ku leşker pîsiyê bi mirovan didin xwarin. Li gundiye Cinibrê ya Cizîrê jî, dî sala 1989'an de kumandarekî bi na-vê Cafer Kaya Çağlayan, bi gundiyan pîsi dabû xwarin. Gundiyan ew dabûn Komîsyona Mafêni Mirovan a Ewrûpayê û dewlet li wir hatibû mehkûmkirin.



BALYOZÉ Fransayê yê ku berê li Tirkîyeyê wezîfe kiribû Eric Rouleau li ser polîtikaya dewleta tîrk di kovara 'Foreign Policy' de nîvîsek nîvîsand. Rouleau dide zanîn ku polîtikaya dewleta tîrk a li hemberî kurdan, ew dewlet xistiye dirûvî dîlekê. Ew dibêje: "Îsal 12 sal in dewletê 40 milyar dollar ji bo ser xerc kiriye."

Li gorî Balyozé berê yê Fransayê heta ku pirsgirêka kurdan çareser nebe, bi tu awayî aboriya Tirkîyeyê sererast nabe. Rouleau diyar dike ku Turgut Özal xwestiye hin gavan biavêje, lê pêk nehatiye. Li gorî gotina wî, Süleyman Demirel û Tansu Çiller bi gotinê leşkeran hereket dîkin.

NÛÇE

HABITAT II: Mêvan bi dilê mazûban in

Çalakiyên 35 rêxistinê dijber bi êrîşa polîsan qediya. Ji ber ku wan dixwest rûyê din ê Tirkîyeyê nîşanî cîhanê bidin û bidin zanîn ku li bakurê Kurdistanê 150 hezar xanî hatine şewitandin. Amadekarê HABITAT'a resmî, helwesta xwe ya berê domandin û li hemberî vê kîrina dewletê jî bêdeng man.

Konferansa duyemîn a ji bo bicîhbûna mirovan ango HABITAT II heftiya çuyî (3'ê pûşperê) dest pê kir. Tevî amadekarîyen mezîn û bergiriyêne sosret jî, hejmareke li gorî hêviya dewleta tîrk, besdar nebû. Serokê Neteweyê Yekbûyî ku Tirkîyeyê wekî federasyonekî bi nav kir û ji ber vê yekê jî bû hedefa êrîşen nîjadperestan, da zanîn ku li dora 13 hezar kesî ji bo vê konferansê hatine Tirkîyeyê. Dîsa Boutrus Ghali bi bîr xist ku, li dora 50 hezar kesî besdarî konferansê NY'ê yên berê bûne.

Di gel ew qas pereyên ku dewletê li rî û peyariyan xerc kîrin jî, tê gotin ku hêviyên wê pûç derketine. Li aliyê din, paqîjkîrîna Kolana İstîklalî (ya Beyoğlu) ji mirov û heywanen bêxwedî bi tenê nebû sedema protestoya heywanparêzan, her wisa jî bû sedem ku civîna rêxistinê sivîl bi rîzgirtina seg û pisîkîn ku hatine kuştin, vebe.

Her wekî ji daxuyaniyê rêxistinê sivîl jî tê fêm-kîrîn, konferansê li ser vê mijarê, yanê peydakîrîna cih û war ji bo mirovan û bajarvaniyê tiştekî girîng e. Lewre iro li ser rûyê dînyayê nêzî 1.4 milyar mirov, ji imkanîn bîdestxistina cihekî hêjâyî jiyanê bêpar in. Her wiha heta sala 2000'î, tê gotin ku wê nîvî mirovahiyê li bajaran bi cih bibe. Tevî ku Neteweyê Yekbûyî di gelek konferans û civînen xwe de daye zanîn ku arîşeyen mirovahiyê pir in jî, heta niha ji bo çareseriya pirsgirêkîn mirovahiyê tu gav nehatine avêtin.

Li gorî rêxistinê ku HABITAT'ê protesto dîkin, ji ber ku civînen fermî tu probleman çareser nakan, rayedarêne dewletan dixwazin rêxistinê sivîl jî bikin şîrikîn súcen xwe. Ji ber vê yekê jî, li kîleka civînen resmî, bi wan jî hînek forûman didin çekirin. Lî raporen ku ew amade dîkin, diçin ber desten rayedarêne dewletan û ew jî li gorî dilê xwe bi kar tînin.

Ey yek îcar jî pêk hat. Rayedarêne dewletan tevî rayedarêne NY'ê, ji xwe re newalek ava kîrin û ev der li insanê din qedexe kîrin. Ëdî kes nizane ci nîqas dîkin. Bi tenê tişte ku heta niha çapemeniyê jê fêm ki-



riye ev e: Hînek jî nûnerên dewletan dibêjin ku mafê peydakîrîna cih û war, mafekî bingehîn ê mirovan. Li hemberî vê, yên din jî dibêjin, "Na, ew mafekî ku bi mafê din ve girêdahî ye." Yanê hê li ser tarîfa mijarê li hev nekkirine.

Li gorî kesen xwedî tecrûbe, mafê peydakîrîna xanî û malan wekî mafê bingehîn bê pejirandin jî zêdetist naguhîre, lewre heta niha tu bîryaren NY'ê yên li dijî berjewendiyêne dewleten mezîn nehatine cih. Her wiha jî li gorî gotina rayedarekî NY'ê, ji bo ku ev konferans bigihîje armanca xwe, pêdivî bi 700 milyar dollarî heye, lê gelek welatan heqê endamtiya xwe nedane, lewre jî NY di nava krîza aborî de ye.

Dema mirov rewşa civîna fermî û ya rêxistinê sivîl dide ber hev, armanca amadekarêne konferansê zêdetir eşkere dibe. Cihê ku lê civînen fermî çedîbin kes nikare têkevê. Heta polîsîn tîrk nikarin daşrayen (tuwaleten) wê derê jî bi kar bînin. Li aliyê din, civînen rêxistinê sivîl li Kampüsê ITÜ ya Taşkışlayê (li gorî daxuyaniya berpirsîn civînan) di bin çavdêriya 100 polîsîn çekdar de pêk tê.

Jîxwe çalakiyên alternatif pişti ku dest pê kir bi du rojan, hate qedexekirin. Roja 31'ê gulanê çalakiyên 35 rêxistinê dijber ên li salona dîlanê ya bi navê La-bella, bi êrîşa polîsan qediya. Li gorî amadekarîyan, wê ew çalakî heta 8'ê pûşperê bidomiyana. Wekî ku Serokê İHD'ê Akîn Birdal jî di vebûna civînen alternatif de diyar kir, wan dixwest rûyê din ê Tirkîyeyê ragihînin cîhanê. Dê wan bida zanîn ku, li bakurê Kurdistanê li dora 4 hezarî gund, 150 hezar xanî hati-

ne şewitandin, bi milyonan kurd hatine koçberkirin.

Rayedarêne NY'ya ku rîzîk û qaydeyên xwe dan bin piyan û konferanseke bi vî rengî li Tirkîyeyê (ku qada ser e) li dar xistin, dengen 35 rêxistinê sivîl nebihîstin.

Lê rêxistinê sivîl bêdeng neman û li gorî karîna xwe, hin çalakî pêk anîn. Wekî mînak, İHD û HADEP'ê li ser rewşa Tîrkiye û Kurdistanê rapor amade kîrin û ew pêşkêşî raya giştî kîrin. Divê bê gotin ku Koma Keskan û berpirsîn civîna sivîl (NGO), helwesta dewletê protesto kîrin. Lewre jî Seroka Koma Keskan Claudia Roth ji aliyê polîsîn tîrk vê bi qasî saetekê hate pirsgirîn. Di gel vê yekê jî Koma Keskan bû alîkar ku rêxistinê sivîl, li Otela The Marmarayê du civînan pêk bînin. Mirovîn bindest di van civînan de ku rojê 2-3'yê pûşperê pêk hatin, daxwaza aşfî û azadiyê anîn zimê.

Bi taybetî serpêhatiyêne ku dayikêne kurd li ser kîrînen hêzen tîrk anîn zimê, gelek mirov metel hiştin. Di vê civîna li ser koçberîye de, maxdûren ser daxwaza xwe ya ji bo rawestina ser daxuyandin. Yek ji besdaran İshak Tepe bû. İshak Tepe diyar kir ku dayikêne kurd tevî ku zarokêne xwe di ser de winda kîrine jî, doza aştiyê diparêzin. Wî got: "Divê kesen ku HABITAT'ê li Tirkîyeyê çedîkin li hemberî vê helwesta dayikêne kurd şerm bikin û ji wan hînî insanetiye bin."

SAMÎ BERBANG

Mêrekî çê:

**Qedera wî jî bûbû ya Feqiyê Teyran, ya
Cegerxwîn. Wî dabû ser şopa wan. Ji vî celebî,
mirov kêm in. Û ew in, ên ku riya mirovahiyê
rohnî dîkin û bi sedsalan nayên jibirkirin.**

OSMAN ÖZÇELİK

Bîst sal berê, di germeke havîna Stenbolê de ez li dermanxaneya xwe ya nû rûniştibûm, diponijîm. Di nav xwingermiya ciwanbûn û berpirsiya dermanxaneyê de diçûm û dihatim. Şerê Başîr şikestibû, hêviya me qurmiçibû. Tevger û rôexistinê kurdan bi hev û din ketibûn.

Deh-panzdeh rôexistinê kurdan ava bûbûn. Hin kes li ser bîr û baweriya Çînê ya Mao, hin li ser riya Enwer Xoce bûn. Hinekan jî dabûn ser rêça Troçkî. Yê li ser riya Stalin û Sovyeta wê rojê, pirtir bûn û pirtirên kurdan di nav “çepen tîrkan” de bûn. Digotin: “Em şoreşgerê navneteweyî ne.”

Welatbezî, welatperwerî wekî nîjadperestiyê dihatin naskirin. Ramanê navneteweyîbûnê, şîûra kurdan di nav keldûxanekê de hiştibû. Rôexistinê kurdan bi dizî dijminatiya hev û din dikirin. Carinan jî dijminatî, derdiket rûyê erdê û bi eşkereyî bi hev û din re şer dikirin. Gelek xorten hêja di vî şerê nediyar de hatin kuştin. Pêwestiya me jî bi yekîtiyê hebû. Belê em bûbûn wekî pezê ku gur ketibe navê.

Ez di nav van ramanan de xemgîn bûm. Xwediyên dukanêni li derdora du kana min, ji min re biyan bû. Sohbata wan li ser kar û pereyan bûn. Li dinya yê ci dibe, ci nabe, ci diqewime nedihat bîra wan. Hebe tune be; mişterî, kar, kîrîn, firotin. Dinyaya wan ev bû. Dinyaya qeşmeriyê... Ji ber vê, danûstandanê min bi wan re kêm bûn.

Wê rojê dîsa bi tenê û bêhnteng bûm. Bi xwendina çend rojnameyan xemgîntir bûbûm. Ji nişka ve Eyüp Alaçabey kete hundir. Dilgeşiyek, nîşana jiyanê ya biçûk di canê min de liviya. Mîna ku mirov ji dostekî kevn û hevalekî dûr nameyekê bigire, heyecan hate min. Bi qasî ku mirov helbesteke evînê bixwîne; an jî, wekî mirov li ser pişta hespekî rewan be û berê singê xwe bide bayekî sivik û hênik, bi çargav ber bi Qerejdaxê biajo, wilo sivikiyê ez rapêcam.

Belê ev ci ye? Rûyê hevalê Eyib ne ges e. Nola ku neyaran dabe ser pişte, helkelhelka wî ye, lêvîn wî ziwa bûne. Di rûyê wî de şopa xemgîniyeke kûr di xuye. Bêsilav dest bi axaftina xwe ya kurt kir: “Osman, Edîb abê, Edîb abê bi qirîza dil ket, niha li Nexweşxaneya Hasekiyê ye.” Pirsên min ji bêhemdî bûn. “Kengê... Çawa!” Eyib domand. “Dermanek jê re divê, belê dermanekî biyan ku bi dest nakeve.”

Hevkarekî min hebû ku dermanê biyan bi dizî difirotin. Em çûn ba wî.

“Edîb abê”, Edip Karahan bû. Edîbê ku qedera xwe bi qedera gelê xwe yî bêsiûd ve girê dabû. Edîbê ku jiyana xwe kiribû qurbana gelê xwe.

Edîb, ji malbateke fireh, kevn û halxweş bû. Mixabin malbatê xwedîfî lê nedikir, têkiliyê xwe ji wî birî bûn. Wan ji ber wî şermi dikirin. Ditirsîn ku ji rûyê Edîb, dewlet wan aciz bike. Wekî gelek ronakbir û welatparêzan, Edîb jî bûbû mirovokî bixof.

Mirovên xwedî ramanê nû, mirovên li dûv jiyaneke birûmet, mirovên li dijî sistemê ne û serî li hemberî zorê, zilmê, kedxwariyê û bêşexsiyetiyê hildidin, zû bi zû ji vê qederê xelas nabîn. Qedera wî jî bûbû ya Feqiyê Teyran, ya Cegerxwîn. Wî dabû ser şopa wan. Ji vî celebî mirov kêm bin jî dîsa li her herêmê têne dîtin. Û ew in ên ku riya mirovahiyê rohnî dîkin. Ew in ên ku bi jiyana xwe bi sedsalan, bi hezarsalan nayên jibirkirin. Ji wan yek jî pis-mamê min Ezîzê Biro bû. Ezîz bû ku Edîb digot: “Min feyza xwe ji wî girtîye.” Ezîz bû ku şitla welatparêziyê û héza berxwedanê di dilê qurnekî de çand. Ew di nav tunebûnê de, bi eşqa welêt çû rehmetê.

Edîb, ji malbatê bi dûr ketibû, belê wî malbateke firehtir û xurtir pejirandibû. Ji ber vê ye ku, ew rojekê li bakur, rojekê li başûrê welatê xwe bû.


Em du xorten kurd ji Edîb re bûbûn malbat

Ew Edîbê bêtirs, ew Edîbê têkoşer, spîrê pênûsê, himê namûsê, niha li odayeke nexweşxaneyê, di nav nivînê spî yê qilêri de, di nav destên bijîşkan de li hêviya me bû. Li hêviya me bû ku em dermanan bigîhîn wî. Em, du xorten kurd ên ku bi evîna welat dişewitîn, ji Edîb re bûbûn malbat, şewata dilê wî, li hemû can û cegera me belay bûbû. Me dilezand ku em bi hawara wî de biçin. Eyib digot: “Osman, ez ditîsim ku wî nas bikin. Ku wî nas bikin jî, tîrsa min ew e ku wî bikujin.”

Ez bîst û sê salî bûm. Min icazeta xwe ya dermanasiyê pişti “Sonda Hipokrat” standibû. Min jê re got: “Na! Kesên ku sonda Hipokrat xwaribin, nexweşen xwe nakujin û nadîn kuştin.” Min hevpîşeyen xwe parastibûn. Pişti gelek salan, ezê têbigihîştima ku, kurdperwer derveyî sondê ne. Minê pişti 12’ê rezbera 1980’an fêm bikira ku, sondxwarî bi destên xwe işkenciyê dikin.

Edîb hiqûq xwendibû. Belê wî ji si-nîfakulteya hiqûqê bêhtir, pirtûkxane, çapxane û qehwxaneyên nivîskaran nas dikirin. Wî piraniya dema xwe li qadên mitîngan, li meş û xwepêşan-

Edip Karahan



danêñ karker û şoreşgeran derbas dikir. Wî hiqûq û mafêñ mirovan ne li fakulteyê, li işkencexaneyan, li dadgehan, li girtîgehan nas kiribû. Wî dîtibû ku hiqûqa ku tê meşandin, ne wekî ya ku li ser rûpelîn spî yêñ ku di fakulteyan de tê xwendin e. Lewre ew ji fakulteyê getiyabû.

Di sala 74’an de lêborîneke tevayî (efûyek) derketibû. Edîb jî, ji vê efûyê bêpar nema. Rabû ji başûrê welêt, ji sirgûniyê zivirî. Hem ji nav lepêñ dadgehan leşkerî û ji girtîgehan xelas bûbû; hem jî, mafê qedandina fakulteyê bi dest ketibû. Pişti navberdayîna 12–13 salan rojekê biryar dabû ku bikeve îm-

tihanîn û fakulteyê biqedine. Di salen “Dawa Wekilî” yê de hêza icazetê (dip-lomayê) ji nêz dîtibû.

Hatibû Stenbolê. Li taxa Laleli, li oteleke erzan, li odayekê bi cih bûbû. Xwe hînî hiqûqa nivîskî dikir. Çiqas zor û zehmet bûya jî; ew mirovê karê zor bû. Li pey hev diket îmtihanîn û di her îmtihanê de bi ser diket.

Hewa germ bû, wî nîv têr, nîv bîrcî xwe dabû xwendinê. Rojê deh saetan dixebeitî. Li ser pirtûka hiqûqê, qîzkejî dîjwar bi dilê wî digit.

Ew dilê ku li hemberî bêhiqûqiyê setkiribû, ew dilê bi bîr û bawerî tiji bû, ew dilê birehm, ew dilê ciwan, çak

çalak, ew dilê wek çûkekê hêj bi heyecan... Edî westiyabû, gotibû bes e...

Derman di destê me de, em gîhîstîn nexwesxaneyê. Kurtikspîyan ji me re gotin: "Bila serê we sax be. Me Edî Beg winda kir. Rehma Xwedê lê be!.. Hûn ci yên wî ne?"

Em du xortêñ kurd; wekî du zarokêñ sêwî ku li ber dîwaran mabin, wilo stûxwar, bêdeng man. Rûyê her yekî ji me bi dilop hêstir şil bû. Paşê hêstir miçiqin. Hêstiran riya xwe guhartin, nehatin der û hêdî hêdî, dilop bi dilop xwe berdan ser dilê me yî disoje. Û her dilop wekî ku bikeve ser sêleke sorbûyi, bi çizinî difûriya. Edî li morgê bû. Singê wî ya bipirç wekî kewarekê, çavêñ wî vekirî bûn.

Te digot qey, li ser axaftineke mitînkekê, li ser nivîsareke rojnameyekê difikire. Wisa sar, bêdeng razayibû. Bi-jîşk "Xuya ye hûn zehf jê hez dikin. Ew ronakbîr bû ne wilo?.. Min ji rona-hiya çavêñ wî fêm kir" got û çû... Paşê ji em...

Cend wêneyêñ li ser mîjiyê me neqîskirî

Roja din di tabûteke xurt de, bi cend hevalan re, wî berê xwe da welêt. Edî abê, ma tuyê wilo biçûya welêt! Çavêñ min li tabûtê, min destê xwe jê re he-jand. Di nav mijen xeyalan de wêneyê wî yê 10–11 sal berê, hat ber çavêñ min. Di Mitînga Amedê de bû. Bi heza-

ran kurd li "Qada Belediyeyê" kom bû-bûn. Em xortêñ liseyê jî, ji çarêka bajêr, bi dirûşmeyan meşiyabûn, hatibûn pêsiya belediyeyê. Pankartêñ di destê me de doza; kar, av, rê û hwd. dikir. Navê welatê me "Doğu" bû. Gelek kes peyivîn, belê ji tu kesî re, bi qasî wî li çepikan nehate xistin. Ew bi kurdî axivîbû. Wî gotibû: "Gelî birayêñ kurd!..."

Bi bejn û bi bal bû. Dengê wî xof di-xist nava dijmin. Tiştên negotî digot. Dev diavêt serkomarê Tirkiyeyê. Ji kurdan re digot: "Edî ma ne bes e? De hişyar bin." Fort dikir, halan dida xwe, pesnê kurdan dida ku heyecan û xîret

E w dilê ku li hemberî bêhiqûqiyê şer kiribû, ew dilê bi bîr û bawerî tîjî bû, ew dilê birehm ê ciwan, çak û çalak, ew dilê wekî çûkekê hêj bi heyecan. Edî westiyabû, gotibû bes e...

were wan.

Ew wêne winda bû, wêneyê wî yê ku sala 1974'an me hev li Amedê, li sî-nemayekê dîtibû, hat ber çavêñ min. Ji Başûr nû vegeiyabû. Parkayekî leşke-rî, pantorekî qedife lê û bereyek ji li se-rî bû. Bereyê E. Che Guevara. Boteke leşkerî di lingan de bû. Bota wî bêbo-yax bû, di bin çengê wî de cend pirtûk hebûn. Simbel, simbelîn wî yên reş û gur, bi brûyên wî yên reş re ketibûn pêşbaziyê.

Paşê wêneyekî din. Kevntir. Li Dêrikê bû. Dixwest ji xwe re dukanekê bi

icare bigire. Tu kesî dukan nedabûyê. Hevalê wî Cewdet, birayê min ê mezin belaş dukanek dabûyê. Wa ye li dukanê rûniştine û li dor maseyeke biçük, bi qasî ku serê wan bigihe hev, nêzik rûniştinê, kurtepist diaxivin. Kes nizane li ser ci projeyê ne. Rojnameyekê nû, belavokek, an meşek li dijî axatîyê...

Hinek wêne hene; nehatibe dîtin, ha-tibe bihîstîn jî, di bin şîura mirov de ewqas jîndar hatine neqîşandin ku, ga-va derdikevin ser şîûrê ji mirov werê ye ku bi xwe dîtiye, jiyaye.

Va ye ji wan yek wêne, hêdî hêdî ji nav xeyalan derdikeve, perdeya mijê ji

gotin ku Edîb, li Bab-i Alî, li kolana Nuruosmaniye diçe qehwexaneyeyeke ni-vîskaran. Li gorî gotinan ew nivîskare-kî xurt e, belê hevdîtina bi wî re bixe-ter e. Ji ber ku xefiyeyen polisan pêxîla wî bernadin û her gav li dû wî ne. Xor-têñ kurd bi nîv heyecan, bi nîv tirs, du dilo diçin ku wî bibînin. Di nav wan de birayê min Hemîd jî heye.

Edîb, kêfxweşîya xwe ya bi hevnas-kirina wan nîşan dide, ji wan re çayê diwesine. Di rabûnê de, tê femkirin ku heqê çayan di bêrîkê de tune. Xort, bi-ûsil heqê çayan didin. Paltoyekî dirêj, heta ku bigihe erdê li xwe kiriye Palto kevn û gemarî ye. Di aliyê hundîre pal-to de, bi dualî, ji jor heta jêr gelek bêrîk çêkirine, di her bêrîkê de jî pirtûkek heye. Ji vê pirtûkxaneya xwe çend pirtû-kan dide xortan.

Hêdî hêdî otobusa tabûta Edîb, ji ber çavêñ min dûr dikeve, xeyal û wêneyêñ wî jî winda dibin. Û ez dibêjim: "De here, Edîb abê! Oxira te ya xêrê be. He-zar spas ji te re!"

Kurd dibêjin "An pişa xwe bidin çi-yayekî asê, yan ji mîrekî çê." Edîb, ciyayekî asê, mîrekî çê bû. Hêja bû ku mirov pişa xwe bida wî.

Di ser koça wî re bîst sal çû belê, ez hêj dibêjim qey wê rojekê derkeve, we-re, bi paltoyê xwe yê dirêj, bi bereyê Che û bi simbelan. Û wê disa bi denge-kî bilind biqire, bibêje: "Ma qey we hêj maşen kurdan nas nekiriye lo!.." Û wê ji nû ve dest bi şer bike.

Nameyeke vekirî

MEDENÎ FERHO



Birêz Mirhem Yiğit! Bi pîrozbahtîyeke mezin ez dest bi nameya xwe dikim. Guman dikim ku tu, sedema vê nameya vekirî dizanî. Careke din bibêjim... Sedem, pirtûka te ya bi navê Helwest⁽¹⁾ e. Dema ku hevalê hêja Dilbixwîn mîzgîniya weşana vê pirtûka te ragihand, bi rastî bêhtir ji her kesî ez, dilşah û bextiyar bûm. Çend caran bi Kekê Elî re jî me dabaşa wê zexelî û nehevaltiya kursî û maseyê ya te, anîbû ziman. Lé, her wekî ku minbihîst, di cih de ez ber bi pirtûkxaneya MED-TV'ye bezîm. Bi dîtina pirtûkê re, parîkî kîfa min şikest. Tu dizanî çîma? Birayê delal, ew qas ked û xwê-dan û ew qas galegal û laqîrdiyêñ hevalen te tevan û bi gişî yên zarokêñ te ku dixwestin te bixin nivîskarekî xwedî pirtûk, di nava qelsî û bêzariya mîzanpaj û estefîka hunerî de 'banga hawarê' dikin.

Careke din ew lebat û livandina te ya tê hêz û hêrs xwe nîşan daye. Berg û mîzan-paj rûpelan, ji sedema nerûniştina te li ber maseyê, ew galegal û laqîrdiyêñ me tevan vala derxistine. Gelo tu nîzanî ku pirtûk hinekî jî bazirganî ye? Daxwaza bazarê û çavdîtîniya xelkê dike? Ez dizanim ku tu bêhtirin ji her kesî vê yekê xweş dizanî..

Lê, ez vekirî bibêjim ku pişti Mîro (bi bîranîna berî 25 salan) pirtûk weşand, edî

çanda kurdî kete qonaxeke fireh û dewle-mend. Bawer nakim ku tu pênuşşorêñ⁽²⁾ din mîna Mîro, dijminê mase û kursiyê hebin. Qet hez ji rûniştina li ber maseyê bi saetan nake. Bi navekî din, em dikarin bibêjîn Mîro, qet hez ji pesin û navdengiye xwe nake. Du: Mîro, gavêñ karbendiya rîzan û pêkanîna civakî, di hêla têgihiştin û fêrkirina polîtîk a demê de pêwistir didît. Rewşenbîriya xwe di hêla kar û bar û pêkanîna karbendiya xwe de didît. Vê yekê di pêşgotina pirtûkê de jî tîne zîmîn.

Karê weşanê û nivîsandinê li ku derê hebûya Mîrhem li wê derê bû. Yanê, di weşan û pêkanîna hinek tiştan de cihê lepêñ Mîrhem her wê xuya bike. Ew geşî û çalakiyêñ têr qerebalix ku di lîwan û salonêñ herî mezin de jî dibûn ba û bahoz û kofendîlîn hêrsbûna kar û bar li her devera kolektîvî tê zîmîn. Mirovên mîna Mîrhem gulgengiyê kar û bar in. Ev şahî û dîlfir-îya Mîrhem, di hevok û dabaşen gotarêñ wî de jî xwe diyar dike. Pir bal nedaye wejarti-na gotin û giliyêñ biyan. Her wekî ku nivîsandinê cur bi cur di semîner û konfer-ansan de hatine gotin, ji bo têgihiştin fêmkirîna xelkê, wekî pêwistiyekî dîtiye. Pişti ku ev nivîsarên xwe berhev kirine jî, wext nedîtiye ku li ser maseyê rûne û wextê xwe bi cend gotinê biyan ên ku ketine nava derya zimanê kurdî re, winda bike. Hevalê Mîrhem ku ez şâş bîm, bibêje...

Lê, di mijareke din de jî, ez ne wekî te difikirim. Heger em kêmânî û xeletiyêñ hevûdin nebînin û nebêjîn, wê pêşveçûn û xwerastkirin çawa çêbîbe? Helbet di warê berheman de... ji ber ku ez bi xwe wekî te diyar kirî: 'Nivîsandinê mîna karbendî û berpirsiyeke welatiyê dinirxînim' ne hobî û

ne valahiya mîjî û danîna karê li ser milan. Ji ber ku qonaxa ku iro kurd tê de ne, bi rastî qonaxeke nazik û delalî ye. Heger şexsiyeten kurd, helbet ew kesen ku bi navê rewşenbirî bangî xwe dike, xwe berpirs nebînin û barhilgiriya vê roja teng, (li gorî hêza xwe) ranegirin, rûpelân dîrokê yên reş spî nabin. Bêguman gotin û giliyê deh salan ku ji nava ava kîmyewî ya mîjiyê te hatine bêjinkirin û wejartin ku di vê pirtûkê de kom bûne, ji bo nişê pêşerojan wê fêdeyeke mezin bidin. Gerek e tu di vê qonaxê de pelax nebî û çar-mîkî rûnenî. Ku tu rûnî ji, ji kerema xwe re li ser kursî rûne û pala xwe bide ser pêgiha maseyê... Ji bo ku ew hewnî te yê têgihiştî bibe çavkaniya pir kesan.

Hevalê hêja, bawer bike, pişti ku te berhem afirandin û dane weşandin, tu kes nikare bibêje çanda kurdî qels û misrî ye. Rast e, çanda kurdî beyar e û nehatiye xil-metkirin, lê wisa xuya dike ku edî mirovên çê dest bi wejartina vê stana beyar kirine û ew şikê û berzêñ neqam ku li ser dilê jiyanâ çanda kurdî hatibûn avakirin, yeko yeko têne hilandin û di dewsa wan de qesr û qonaxên têr ronahî têne avakirin. Destpêk be jî, bingeha vê avahiyê bi guhertin û nûjeniya şoreşgerî û têr bedel di qonaxeke hêviyê de ye. Lewre jî hewceyî bi kesen mîna te heye. Bo kirin û ragihandina demsalan... Ji bilî ya rojane, ya demsalan!...

Silavêñ germ û bi dilekî safî serkeftina te dixwazim. Serkeftina mirovên mîna te serkeftina gelê kurd e.

1/Helwest: Mirhem Yiğit, Weşanên Medya, Back, 165 12 33 Hagesten/Sweden, 1996

2/Pênuşşor: Kesen ku pênuşê bi kar tîne û dide sorkirin.

Li hemberî kurdan edaleta Îngilistanê

**Her çiqas wekî meseleyeke ku şexsê min eleqedar dike,
bê pêşkêşkirin jî, domandina bendibûna min û tehdîta radestkirina
min a Almanyayê piştevaniya dewleta îngiliz a ji bo polîtikayê
ku dewleta tirk li ser kurdan dimeşîne, destnîşan dike.**

LOUIS CLAIRE

Di 20'ê kewçêra 1994'an de Berpirsê ERNK'ya Ewrûpayê Kanî Yilmaz li ser vexwendina endameki parlementoya Îngilistanê gihîst wî welatî. Dema ew ji balafirê peya bû, ofisa biyanan destûr dayê ku ew bikeve hundirê Îngilistanê. Di 26'ê kewçêra de Kanî Yilmaz li ser riya parlementoyê hate girtin. Ew diçû ku di civîneke li parlementoyê de axaftinekê bike. Armanca civînê, nîqaşkirina riya çareyên siyasi ji bo kêşeya kurdî bû. Axaftina wî jî li ser vê yekê û tiştên ku dewleta îngiliz di vî warî de kare bike, bû.

Wezîrê Karê Hundirîn Micheal Howard, biryara girtina Kanî Yilmaz parast û wekî sedema girtina wî jî "metirsîya ewletiya netewe-yî" nîşan da. Sedema ku wî pêşkêş kir, bêbinî bû, tu delîl jê re nîn bûn.

Kanî Yilmaz 5 carê din hatibû vî welatî, di van hatinêne xwe de tu gavek jî li dijî zagona biyanan neavêtibû. Ew şexsiyeteki nasdar e, ku bi peywîrén diplomatîk li gelek welatîn Ewrûpayê maye û bi gelek rayedarên van welatan re hevdîtin pêk anîne.. Pişti ku wî deh salen xwe li Girtîgeha Amedê û hin girtîgehîn din ên dewleta tirk, di nav tahde û işkenceyê de derbas kirin, ew wekî penaberekî li Almanyayê dijiya. Sedema razana wî li girtîgehîn tirk, parastina mafêne kurdan ên çandî, siyasi û rîexistinî bûn. Tê zanîn ku ev maf hemû ji aliye dewleta tirk ve hatine paşçavkirin.

Sê heftîyan pişti binçavkirin û hepiskirina Kanî Yilmaz, serfilêdanekî Almanyayê ji bo radestkirina wî gihîst destê rayedarên îngiliz. Dema ev serfilêdan pêk hat, Kanî Yilmaz li cihîkî taybet di binçav de bû. Taybetiya vî cihî, rî nedida ku mirov bêne serdana wî, an jî ew bi kesen li derive re bikeve danûstandinan.

Serfilêdana ji bo radestkirinê, di 27'ê firmeha 1995'an de eşkere bû. Ev serfilêdan bi erêni hate bersivandin, tevî dijayetiya 67 mebûs, endamên Parlementoya Ewrûpayê û lordan. Ji bo betalkirina vê biryarê, Kanî Yilmaz serî li dadgeha bilind da.

Almanya dixwaze bi 188 dozan Yilmaz bidarizîne

Parêzera Kanî Yilmaz li ser dozê, daxuyaniyek da raya giştî, di vê daxuyaniyê de wiha tê gotin: "Doza li dijî Kanî Yilmaz ji ber gelek sedeman hemû kesen ku xema parastina mafêne mirovan dikişînin, dixe nava endîşeyê. Ji van sedeman a herî diyar ev e, Kanî Yilmaz li Almanyayê wê ji ber 188 dozan bê darizandin. Tevî ev qas doz, defilîn ku heta niha ji aliye rayedarên alman ve hatine pêşkêşkirin, tevde bêbinî ne. Hikûmeta alman dixwaze Kanî Yilmaz ji ber endamtiya rîexistineke qedexekirî ango Partiya Karkerê Kurdistanê bidarizîne, ku súcekî wisa di zagonê Îngilistanê de tune ye, lewre PKK li wî welatî nehatîye qedexekî-



rin. Her wiha jî ne tiştekî li derî zagonan e ku li Îngilistanê mirov bibe endamê PKK'ê."

Digel vê rastiyê jî, Almanya tu garantîyê nade ku wê Kanî Yilmaz ji ber vî sûcî nedari-zîne. Her wiha Almanya disa tu garantîyê nade ku wê Kanî Yilmaz radestî Tirkîyeyê neke, ku li wir işkence, bi iştimaleke mezin jî, kuştin riya wî dipê. Her kes dizane ku Kanî Yilmaz li Hollandayê jî xwedîyê mafê penaberîya siyasi ye, lê disa jî hikûmeta îngiliz di dewsa vî welatî de, wî dide Almanyayê.

Tevî daxuyaniyên sempatiya ji bo kurdan ku hikûmeta îngiliz gelek caran li ber çavên cemawerî diyar kiriye û pejirandina rastiya ku kurd li Tirkîyeyê bi kîrinê hovane û nemirovî re, rû bi rû dimînîn, wisa xuya ye ku tiştên li riya Kanî Yilmaz ne xema wê ne.

Heke Kanî Yilmaz radestî Almanyayê bibe, ewê wî bidin Tirkîyeyê, li wir jî wê işkence lê bê kîrin, heta dibe ku ew bê kuştin jî. Bi girtin û bendîkirina Kanî Yilmaz, hikûmeta îngiliz nîşan da ku, ew jî hevkarek e ji tevdîren şermnak ên li dijî gelê kurd re. Ev kîrin wekî diyarekî ye ji dewleta tirk re.

Desthilatdarên îngiliz bi awayekî kevneşopî li dijî gelê kurd in. Ew ditîrsin ku li-hevrûniştineke siyasi di navbera kurd û tirkân de bibe sedema xerabûna statukoya Rojhîlata Navîn. Ji ber vê yekê, ew çareseriya leşkerî tercîh dike. Ger ew çareseri bê wateya tevkûjî û qirkirinê kurdan jî, ne xem e ji bo wê.

Tirsa Îngilistanê

Kanî Yilmaz ji raya giştî ya îngiliz re wiha dibêje: "Girtina min a ku 18 meh in didome, encameke dijminatiya Îngilistanê ya li dijî têkoşîna meşrû ya azadiya gelê kurd e. Nîşana piştgiriyê ye ji bo polîtikayê dewleta tirk ên bi rengî işkence û qirkirinê. Her çiqas wekî meseleyeke ku şexsê min eleqedar dike, bê pêşkêşkirin jî, domandina bendibûna min û tehdîta radestkirina min a Almanyayê, piştevaniya dewleta îngiliz a ji bo polîtikayê ku dewleta tirk li ser kurdan dimeşîne, destnîşan dike."

Di 20'ê gulana 1996'an de serfilêdana Kanî Yilmaz a ji bo betalkirina biryara radestkirinê, li dadgeheke herêmî hate nirxandin û tu encam ji nirxandina vê dadgehê derneket.

Tiştekî kevneşopî ye ku serfilêdanen bi vî rengî li Dadgeha Bilind a ku li Londonê ye, bê bersivandin. Lî hikûmeta îngiliz biryara tiştekî ku tu carî nehatibû kîrin, girt. Hate diyar kîrin ku wê serfilêdan li dadgeha herêmî ya li nêzî girtîgeha ku Kanî Yilmaz tê girtin, bê nirxandin. Wekî sedema vê biryarê jî metirsîyen ewlehi nîşan da. Ev biryara sosret jî dide zanîn ku hikûmeta îngiliz ji berteka civaka kurd a li Îngilistanê ditirse. Her wisa dîsa ev yek eşkere dike ew bi xwe dizanîn ku girtin û bendîkirina Kanî Yilmaz tawaneke li dijî mafêne mirovan û erîseke rasterast a li ser gelê kurd e.

WERGERA JI İNGİLİZİ: SAMİ TAN



● **11.6.1930:** Ji bo perçiqandina Serhildana Çiyayê Agirî aîkariya Îrâne. Di destpêka pûşpera sala 1930'an de dewleta tîrk ji bo têkbirîna Serhildana Çiyayê Agirî ji dewleta Îrâne aîkariyê dixwaze, berdêla aîkariyê jî herêmeke Bakurê Çiyayê Agirî ye.

Hemû gundên kurdan ku li wir hene wekî sitareya şervanê kurdan dide zanîn. Piş re jî wan gundan cîde valakirin û pêşkêşî dewleta Îrâne dike. Pişî vê yekê, hêzên Îran û Tirkîyê bi hev re êrişî ser şervanê kurd kirin.

● **15.6.1909:** Rojnameya Peymanê dest bi weşanê kir. Rojnameya Peymanê ji 20 rojan carekê, bi tenê 12 hejmar derketiye. Rojname bi pişgiriya îtihat Terakiyê ji aliye Hilmi Ziya Ülken û Ziya Gökalp ve hatiye we-

şandin. Di hejmara rojnameyê ya dawîn de nivîseke Ziya Gökalp bi kurdî derketiye. Navê wê nivîse "Gelî kurmanca, gelî bira!" ne.

Ziya Gökalp bi vê nivîsa xwe, fêlén ku îtihat Terakî dixwaze li ser kurdan bilîze pêşkêş dike, wekî ku kurd nîn in, tev tîrk in û ji nîşen osmanî hatine, hewce ye kurd pişgiriya paşayê osmanî bikin, dînîşîne.

● **15.6.1970:** Li Stenbolê destpêka serhildana karkeran a mezin. Karker li hemberî mêtîngîriyê û li dijî biryara DGM'ê ya ji bo girtina Sendikaya DISK'ê meşen girseyî pêk anîn. Ev serhildana ku di sala 1970'yî bi sloganê li dijî kedxwariyê pêk hat, wekî "Liberxwedana 15-16'ê Pûşperê" tê zanîn. Pişî vê berxwedanê DGM'ê biryara xwe ya der barê DISK'ê de bi şûn ve kişand.

AWIR

Bûyera 60 sal berê hê jî zindî ye

'Rojekê leşkerên tîrk bi kumandariya Tahsîn Beg girtin ser gundê me. Ji gundê dora me, gelek jinê kurd dabûn hev û li hespên xwe kiribûn û bi xwe re digerandin. Hem li wan dixistin, hem jî kîfa xwe bi wan dianîn.'

Jinê kurd bi xwe dîrokê qeyd di-kin. Nanivîsin, di bîra xwe û di hişê xwe de dihêlin. Wekî ku tiş-tek di bin erdê de namîne û şin-dibe, ev bîranînen wan jî şin têñ û bejn diavêjin. Li hêla din ew tim û tim bi êri-şen dijmin ên kirêt re jî rû bi rû dimînin.

Meta Hecî Rebîa (Rabia Doğela) yek ji wan dayikêñ kurdan e. Meta Rebîa niha 70 salî ye û bi eslê xwe ji gundê Pîrûwayê ye ku li ser Kerborana Mérđinê ye. Wê hin bîranînen xwe ji me re gotin.

"Ez 10-12 salî bûm, diya min mûxtara Pîrûwayê bû. Navê wê Xecê Xanim bû. Di wê demê de leşkerên romê digirin ser gundê me, dan û bulxurên me tevî hev dikirin, genim û arvanê me dirijandin. Ne digotin kal û pîr e, zar û zêc e, li hemû kesan didan û dest diavêtin namûsa me."

Serm dikir ku van gotinan bibêje, me zor dayê û ew peyivandin.

Meta Rebîa nimêkar e. 24 saetan sel-watan dide. Gava ku wê bîranînen xwe digotin jî, dîsa selewat didan û çavên wê digot: "Xwedê mirov ji leşkerên tîrkan bisitrîne." Meta Rebîa gotinê xwe berdewam dike:

"Rojekê leşkerên tîrk bi kumandariya Tahsîn Beg girtin ser gundê me. Ji gundê dora me, gelek jinê kurd dabûn hev û li hespên xwe kiribûn û bi xwe re digerandin. Hem li wan dixistin û hem jî kîfa xwe bi wan dianîn.

Tê bîra min, pîrekeke xweşik û bi hemle hebû. Wê bala min kişand. Tahsîn Beg ji diya min Xecê Xanim 7 jî xwestin. Diya min gote Tahsîn Beg:

'Ka emê ji we re nan çêkin.' Got: 'Ez nanê kurdan naxwim.'

Di vê navê de qasidê Mudirê Kerboranê hat gund. Kaxizek dirêjî Tahsîn Beg kir. Mudir gotibû ku 'Xecê Xanim ji bo navçeya me muxtareke rind e, dos-teke qenc e.'

Tahsîn Beg got: 'Ne 7 pîrek, sisêyan bidin.'


Gelekî li ber geriya qasidê mudir. Paşê got: 'Bila 3 tivingan bide, ezê herim.' Diya min ev qebûl kir, paşê Tahsîn Beg çû. Dûv re diya min tiving kîrîn, birin dan Tahsîn Beg. Sibê zû hatin gund, heta eşakî man li gund.'

Meta Hecî Rebîa niha jî bi 70 saliya xwe ji ber dewleta tîrk reviyaye hatiye di çadıra şemedanî de, li gundê Subâşî ya navçeya Torbalîyê, rûdine.

Meta Rebîa ji ber ku pir bûye, nikare biçe bişixule. Li nav çadıran dimîne û li ber zarokan e. Heke karibe, êvarê jî şîvê ji kar-keran re çedike, lê jî nimê û selewatên xwe namîne.

FEREK KURÊŞIVAN

ÇAVDÊRÎ



MIRHEM YİĞİT

Li ser cihêyî û
xweseriya
Serokatiya Apo

Hewla kuştina Serok, gelê kurd rakir ser piyan. Mîna ku erd û axa di bin piyên kurdan de biheje, cîhana kurdan çû û hat. Deng û qîrîn ji her derê bîlind bû. Dînya, dost û dijminen kurdan careke din bi çavên serê xwe dibînin bê ka kurd çendî girêdayî Apo ne, çendî bendewar û dildarê serokê xwe ne. Apo ji bo kurdan bûye navê yekîtiya neteweyî û navê yekîtiya hunermendiya siyâşî û leşkerî.

Cara ewil e ku gelê kurd bi vê serokatiyê ew çendî li serxwebûn û azadiya xwe nêzîk dibe û ew çendî bi serokatiya xwe re bi hismendî dibe yek. Gelê kurd çendî hez ji wî bike, çendî di dil û mîjiyê xwe de cihê wî saxlem û abadîn bike heq e, kêm e û ne zêde ye.

Dawiya havînê û destpêka payîza 1994'an em komeke heşkesî ji endam û dostên YRWK'ê çûbûn Rojhilata Navîn û em qederê mehekê li ba Serok mabûn. Pişî em vegeyîan Swêdê bi demekê, li bajarê Upsalayê şeveke gel hate çêkirin û birêveberen şevê ji Amed Tigrîs û min xwestin ku em bi munasebeta serdana serok ji bo gel çend gotinan bibêjin. Ev çend gotinê li jêrê min not girtibûn:

"Em bi dilekî xurt û heyecaneke mezîn ji bo xebatê ji ba Serok vegeyîan. Berî ku em herin balê jî, baweriya me pê bêşînor bû û di dilê me de cihê wî mezîn bû. Çûna balê û çend hefteyen me li wê derbas kirin, bawerî û imana pê, bi siyaset û rêberiya Serok hê xurtir kir û cihê wî di dilê me de hinekî din mezintir kir. Serokatî, serokatiyeke cidî, rast û durist, ne karekî hêsan e. Jixwe ku li Kurdistanê be, ne xercê her kesî ye û ne barekî ku her kes karibe di bin de rabe. Bi gotinê din, serokatî ne karê her kesî ye û her kes nikare bibe serok."

Celeb û kategoriyê serokatiyê hene. Gelê me û mirovîn kurd hejmarek rengîn serokatiyê dinasin: Serokatiyê herêmî û navçeyî, serokatiyê malbatî, eşîrtî, mezhebî, parçeyî û klasikî.

Serokatî hene ku pişî çend gavan ji rê vegeyîane, serokatî û sekreterî hene ku lawên rojên rihet, rojên fireh û bêdiwarî ne. Gava dijmin radihêje darê xwe, li tank û balafirên xwe siwar dibe, berê topan dide welat, şapa leşker radîke ûşê îşkence û lêdanê dixe kar, direvin; xwe vedîşerîn û dîbin dizên şekalan.

Ne ev bi tenê serokatî hene, sekreterî hene, serokatî û sekreteriyê du-sê salan, havîn û biharekî yan jî demsal û mewşîmî hene.

Serokatî û sekreterî hene doh sekreter bûn, îro bûne şefîn xwaringeh û aşpêjxaneyan, bûne tacir û bazirgan û rojê 18 saetan hevîr destirêن.


Ü yeke din:

Serokatî hene ku dijmin ew xapandine, dijmin bi wan dilîze û bi xefik û dolabîn xwe ew li cihê mîna Wiyana û Berlînê kuştine, ew şehîd xistine.

Serokatiya Apo, serokatiya Apê me cihê ye. Ne ji tu celebî ji van celeban e ku heta niha hatine û çûne li Kurdistanê. Dîroka me serokatiyeke wiha nas nake. Serokatiya wî serokatiyeke neteweyî û hemdem e, hişyar û nişmî ye. Dijmin û dijminan baş dinase. Li ser esasekî nû, bingehêke bi xwe bawer û baweriya bi gel ava bûye û hatiye heta bi îro. Ev serokatî serokatiya şertîn dijwar, serokatiya rojîn qewamê, demêñ ku her der dibe agir û rojîn ku dibe qiyamet û ferman.

Serokatiya Apo şareza ye, saxlem û tecrûbekirî ye. Wekî rûnê helandî û zêr-bîst û çar eyarî ye. Her wiha bi gelek aliyeñ xwe orjinal e, pişta xwe dide 30 milyon kurd û bûye garantî û sigorteya wêbeyek serbilind ji bo Kurdistanê. Rehêñ vê serokatiyê kûr in, qurmê dara vê serokatiyê qalind û stûr e û sloganâ vê serokatiyê eşkere ye, dinya dizane:

An serkeftin an serkeftin.



Gerînendeyê Weşanê yê Giştî yê Agosê, Hîrant Dink:

Ew ci bager bû gelê me belawela kiri

Ermen; gelekî qirkirî û parçebûyî. Hejmara wî gelî li Tirkiyeyê dakteyiye 60 hezarî. Zêde tişt li ser ermenan nayê zanîn, ji ber ku hemû çalakiyên wan di nava civakê de mane. Berî 2 mehan rojnameyeke bi navê Agosê, li Stenbolê bi tirkî-ermenî dest bi weşanê kir. Hevala me AYNUR BOZKURT bi Gerînendeyê vê rojnameye Hîrant Dink re li ser gelek mijaran peyivî.

Bi pirseke klasik em dest pê bikin. Çi ye Agos?

– Maneya Agosê, mirov kare bibêje xeta zeviyê ye. Ew, bi gîsinê tê vekirin, tov di nav de tê çandin û av jî tê re derbas dibe. Yanê erx e, ku di tirkî de jî mîna “ark, arık” tê bikaranîn. Bi ermenî, jê re agos tê gotin.

Cîma “Agos”?

– Civaka ermenan, ev demeke dirêj e, heta em dikarin bibêjin ku ji cumhûriyetê û bi vir ve, tenê mîrasa xwe ya çandî ya di dîroka xwe de xwariye û her wi-sa maye. Yanê ji berê xwe xwariye, tenê bi wan tiştan pesnê xwe daye û zêde tişt-tek ji nekiriye. Lî belê potansiyeleke gelekî mezin heye, ku di dawa wan de gelek tişt hene. Ji bo domandina taybetiya gelê me ya berdar a klasik, ew dikarin hin tiştan bikin. Ew dikarin tiştên di dawa xwe de dârijînin û bidin însanên din. Eger ew xwedî hin îmkanan bin, ez bawer dikim ku wê ji însanên din re jî bin bin mînakên baş. Ji ber vê yekê jî me got “Agos”.

Cend kes di Agosê de dixebeitin?

– Di navbera 12 – 13'an de kadroyêne me hene. Ji xeynî wan, gelek hevalen me yê alîkar ji hene. Ew jî, ji 15–20 kesî zêdetir in.

Vêga tîraja we çiqas e?

– Ji 3 hezarî hinek borî. Roj bi roj eleqe zêdetir dibe. Bi taybetî jî, ji xeynî xwendevanên ermen, gelek kesen din jî uslûba me, awayê me diecibînin.

Armanca we ji derxistina rojnameyeke bi vî rengî ci ye?

– Du sebeb hene. Ya yekemîn: Di nav cemaeta me de zimanê ermenî kêm tê bikaranîn. Yek ji sebebên wî; di serî de, problema giştî ya civakê, meseleya modernîzasyonê ye. Însan bi tesîra Rovîja ji nirx û çanda xwe dûr dikevin. A duyemîn jî; di van 30–40 salên dawîn de li Anatoliyê mirovîn me neman. Tev ji Sêwazê, Meletê, Amedê, Qeyseriyê, Mîrdînê, Wanê, Yozgatê, ji Tokatê koçî Stenbolê bûne. Zarokên van kesan çûne dibistanen ermenan û hinek hînî ermenîyê bûne. Lî ew kesen ku ji dibistanê hî-

nî ermeniyê bûne jî, bi tenê bi hînbûna xwe mane. Yanê li ku derê û çîma bi zimanê ermenî biçeyivin? Zimanê ermenî zêde nayê bikaranîn û hate jibîrkirin jî. Ji ber wê yekê jî divê mirov xwe bigihîne wan kesan.

Sebeba duyemîn a gelekî girîng; civaka mezîn a ku em tê de dijîn –ku di nav de civaka tirk, kurd û hwd. jî henebi rastî jî me baş nas nakin. Em mecbûr in ku xwe bidin nasîn. Kî ne em, ci ne, çand û hunera me, awayê jiyana me, em ci difikirin, li siyasetê, li dînyayê çawa dinîrin, divê nas bikin û bizanîn.

Çunkî hin kes me bi awayekî ku em ne wisa ne, didin nasîn. Hin sebebên wê jî hene ku hûn jî dizanîn, ez naxwazim bikevime nav wan.

Ji xeynî we, hin rojnameyên ermenan derdikevin. Hün wan çawa dinirxînîn?

– Ew saziyên gelekî girîng in. Rojnameya Jamanak û Marmara hene. Her du jî bi zimanê ermenî derdikevin. Yek ji wan (Jamanak) 88 salî ye û xwedî payeye rojnameya herî kevn a Tirkiyeyê ye. Rojnameya Marmara jî 50 sal, li dû xwe hişt.

Eger heta vêga me ziman û çanda xwe hinekî li vî welatî parastibe, bi saya wan e. Karê ku heta vêga wan kiriye, gelekî mezin e.

Agos rojnameya ermenan e, lê gelekî hindik cih ji ermenî re tê vegetandin. Li gorî we ji bo neteweyekê hêmana zîmîn çiqas girîng e? Hele dema ew netewe, di nav civakên din de ber bi helandinê ve here.

– Ev pirs gelekî di cih de ye. Ziman gelekî muhîm e. Me dema dest bi projeyâ derxistina rojmeyeke bi vî rengî kir, ev pirs her tim li ber me mîna dîwarekê bû; gelô em rast dîkin an xelet? Yanê gelo emê bibine sebeb ku, zimanê ermenî bêhtir neyê bikaranîn?

Lî belê baweriyeke me bi xwe hebû. Heta vêga sisteme me ya ku mîna civakeke girtî jiyaye, em ji vî helandinê ne-parastine, ev yek. Ya duyemîn jî; ji ber zimanê gelek însanî têkilîyên xwe bi cemaevê re qut kirine. Ka hûnê ci bikin? Divê ci bê kirin? Yanê, divê mirov jiyana xwe ya nasnameyî, çandî û hunerî te-



Rojnameya Agosê ev 2 meh e ku li Stenbolê dest bi weşanê kiriye. Di 8 rûpelên bi zimanê tirkî de wekî pêvedanînekê 2 rûpelên bi ermenî cih digirin.

Ew, bi awayekî heftane derdikeve.


Pîvana Agosê: 56x37.8 cm. ye.

nê bi zîmîn ve girê bide, an, bi bikaranîna zimanê din jî ev tiştên ku me behs kirin, dikarin werin parastin? Li gorî me eva duyemîn rastir û mimkun e. Me ev rî ji xwe re bijart û em bawer dîkin ku ev tişt jî rast e.


Ha, hummeta min jî li hemberî endîşeyâ we heye. Çunkî ez jî du salan di nav wê endîşeyê de mam û hê jî ew dewam dîke. Emê vêga, mîna civakeke vekirî, di nav civaka vekirî de, emê xwe bi ci awayî biparêzin, em wê diceribînin.

Hûn di nivîseke xwe de dibêjin ku, yek ji sebebên herî girîng a ku bûye sebeba drama dîrokî ya gelê ermenan, cu-datî û nelîhevkirina mezheban e ji. Vê mijarê dikarin hinekî din vekin?

– Dinya tev de ji vê dramê haydar e, her kes dizane. Bifikirin, gelekî ku di Împaratoriya Osmanî de, mohra xwe li hereketen demokratik daye, di teorî û pratîkê de mohra xwe lê daye, di dawiyê de qirkirineke ku hîç heq nake li hemberî wî pêk tê. Dîroka resmî ci dibêje bila



"Ez ji Meleté me. Di 1954'an de hatime dinyayê. Li Stenbolê di sêwîxaneyan de mezin bûm. Pêşî li Zanîngeha Stenbolê Beşa Fakulteya Biyolojiyê, dû re jî li Fakulteya Fen-Edebiyatê Beşa Felsefeyê min xwend. Di dema 80'yan de ji ber sebebén cur bi cur ez hatim girtin. Berê ez bi karê pirtûk û weşanan re eleqedar dibûm. Min rojnamevantî nekiribû lé, niviskar û xwendevanevê baş im."



ya Tanzîmatê de ew mîsyonerên ku min behs kiribû hatine û li déra ermenan mîna cihê nêçirê nihertine. Piştî wê jî, çekênen xwe yên dunyewî xistine nav wî ci-hê nêçirê; her wiha jî pere, madiyat û îmkan xistine.

Li Anatoliyê Kolejê Amerikan vekirine, li Tarsûsê, Wanê û hwd. Bi wî awayî jî, wê dêrê parce kirine. Encam li holê ye: Gelê parçebûyî.

Li Tirkîyeyê hê jî, ji ber qirkirina ermenan sendromek heye. Dewlet hê jî vê yekê qebûl nake. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?

— Ma ezê çawa binirxînim! Ez ermen im û dîroka xwe jî baş dizanim. Hûn jî dibe ku kurd, tirk an jî ji miletekî din bin. Hûn jî mecbûr in ku dîroka xwe baş bizaribin. Li gorî min, ev problema we ye. Berî vêga min resimek an jî tabloyek li ber çavêne we xêz kir. Çi karê ermenan li Ûrûgûayê, Arjantînê, Amerikayê û virde wirde heye?! Yanê bi mantiqeke rast divê van tiştan mirov bîne ber çavêne xwe û querara xwe bide.

Ha ev jî heye: Di nav civaka tirk an jî kurdan de, hin kes ermen jî wê bûyerê parastine, veşartine, alîkarî dane. Ji ber wê yekê jî ne rast e ku mirov topyekûn ji her kesî re an jî, ji gelan re bibêje, "Hûn tevde wisa bûn û we tevde nizanîm ci anîne serê me û falan filan."

Lê belê divê mirov vê baş deyne hollê ku, di dîrokê de ev bûyer qewimiye. Ku hûn bibêjin "Na, nebûye"; bibêjin. Ew jî problema we ye. Hûn xeletiyê xwe her bidomîn. Heger hûn bikaribin tevi zanîna wê dîrokê bi hev re bijîn –ez behsa jiyaneke li nik hev û din nakim, çunkî jiyana li nik hev û din gelekî bitâlûke ye– tê wê wateyê ku bergeha we, çeperen jiyana we ya pêşerojê fireh e.

Der heqê hejmara ermenan de agahîya we hene gelo?

— Li gorî texmînan, li Tirkîyeyê 60-80 hezar ermen dijîn. Li temamî dînyayê jî 7 milyon; 3 milyon û nîv li Ermenistanê, yê din jî ew kesen belavbûyi.

Bi taybetî ew kesen nexwedidewlet û welat, her tim hesreta çûyîna cih û warexwe dikişinin. Edî welatê ermenan jî heye. Çima tevde venagerin welatê xwe?

— Li gorî min, li welatekî din, weki ermen ku hûn bikaribin bijîn, ew bes e. Tiştê esas ew e. Meclîsa Ermenistanê di van demen dawîn de bi ya min, biryareke gelekî rast stand. Yanê, pêşniyaza cot-welatiyê, li meclîsa xwe red kir. Got, "Ermenistan, welatê wan kesen ku li Ermenistanê dijîn e. Mafê hilbijartin û danbijartînê ancax aîdi wan kesan e. È tabî ci heqê min heye ku ez herim, ew kesen ku 70-80 sal e li wê derê jiyane, derd û êşen xwe li wê derê kişandine, xwe bikim şîrîkê wan û ji mafen wan îs-

**Bi taybetî
van 10 salen dawîn
tiştênu li Rojhilat
diqewimin, çavêne mirovan
ditirsînin, ew rewş bi serê
xwe problemeke mezin e.
Heta ku ev pirsgirêk neyê
çareserkirin, ev welat
ê çawa bigihîje
rewşa asayıyê,
ez nizanim.**

tîfade bikim. Li wê derê min tu ber nefirandîye.

Min li vê derê hilberîn kiriye û hebûna min li vê derê reh vedaye. Ancax mafê min heye ku, ez li vî welatî xwedigotin bim der heqê pirsgirêkên vî welatî de.

Rewşa iro ya Tirkîyeyê çawa dibînin?

— Baş nabînim. Der heqê pêşeroja Tirkîyeyê de, ez bi endişe me. Carekê ji aliyê aborî ve, ev welat ber bi terazînê (uçurum) ve diçe. Ji xeynî wê, zêdebûna betal û bêkaran, pirsgirêka demokrasiyê

û bi taybetî van 10 salen dawîn tiştênu ku li Rojhilat diqewimin, çavêne mirovan ditirsînin, ew rewş bi serê xwe problemeke mezin e. Heta ku ev pirsgirêk neyê çareserkirin û li ser vê yekê lihevki-nen çenebe, ev welat wê çawa bigihîje rewşa asayıyê, ez nizanim.

Ji ber wê yekê jî, li gorî min wezîfeyen mezin dikevin ser milen demokratîji her qadêne civakê. Eger ku tiştêku baş pêk were, bi saya wan kesen demokrat wê çêbe.


Li ser medyaya tırkan ci difikirin?

— Medya bi temamî xitimiye. Gelek ji wan, ji heqê ticaretê, bazirganiyê baş derdikevin. Lî, rojnamevanî û reberiya gel çiqas pêk tinin, mirov nikare bersiveke erenî bide vê pirsê. Ji bo tevan nabejim vî tiştî. Lî belê qismekî mezin na-veroka karê rojnamevantî û televizyonê guhertine.

Divê binê wan qef û qoran, quşxane û taweyan qul bibe ku êdi gel jî, ji bo bi-ditixstina wan firaq miraqa bi pey wan nekeve. Ha, wê kengê binê wan quşxane û taweyan qul bibe, nizanim.

Dixwazim pirsa xwe ya dawî bipirsim. Hé jî dewlet hebûna kurdan qebûl nake. Ku were qebûlkin jî bi awayekî nelê ye. Ji bo Serok û gerîlayen PKK'ê û heta ji gundiyen ku tén kuştin re jî dibêjin, "Ew ermen in, sunet jî nebûne û hwd." Di şexsê wan de heqaretê li ermenan dîkin. Ji berê ve van gotinan bi karîn. Hûn ci dibêjin li ser vê yekê?

— Tabî em gelekî xemgîn dibin. Em ermen gelekî baş dizanîn ku ev yek ne rast e. Ez vê her tim dibêjin, vê carê jî tekrar dikim. Eger ermen li refekî bin, ne di nav refî PKK'ê de, di nav artêsa tirk de cih digirin. Em zarokên xwe dişînîn leşkeriyê, naşînî ji PKK'ê re. Ew tiştê ku dibêjin, metoda ajîtasyonâ psikolojik e. Di paşerojê de jî ev metod bi kar anîne û gelekî jê feyde standine. Di vê wisa nekin. Heta dewleta Ermenistanê daxuyand ku ew ne di nav vî karî de ne.



Pêla evînê

Bedirxan, nîvîsî ji milet re, ji mirovatiyê re, ji pîrekê re, ji Feradê re, ji Asya û Afrika û Amerîkayê re, û ji gundî û dost û hevalên xwe re. Ew dostê Nazım Hikmet bû. Mirovê ku Aragon nasiye bi welatê xwe û dengê xwe gihand hemû aliyan cîhanê.

Hamid Bedirxan

Bedirxan, helbestvanê ji başûrê biçûk e. Helbestvanê ku ji kaniya keder, eş, derd, xem û berxwedanê vexwari-bû. Yê ku zimanê perîşan û belengazan bilind kiribû.

Bedirxan, yê ku koçber bû li ser "Riyen Asya" yên girtî û xwediyê nasnameya parcekirî bû.

Ew, yê ku hozan bû, li ser girêñ axî yên ku keçen zagrosî xwe di pişt de ve-dişerîn û evînên xwe dirêsin. Bedirxan, baz bû, yê ku çavêñ xwe nedigirtin li ser zilm û zordariya dijminan.

Ew, yê ku Louis Aragon nasiye bi çiyayêñ Asyayê, ew çiyayêñ veşartî. Ew, xwediyê gotina "Yen ku di cîhanê de, karin bi hev re bifikirin."

Bedirxan, ew ê ku şoreşa birçibûnê û jarî û belengaziyê hilgirtibû ser milen xwe, ta ku bigihîne bihuşta ciwantiyê. Ew ê ku razabû di şikefta tarî de û his-yarbûna wî li ser rimerima dengê dahola Asyayê bû.

Bedirxan, ewê ku bi pênuşa xwe li ser pêlén Çemê Feradê dagirtibû. Ew, ê ku li konsera "Gilgamiş"ê hazır bû û yê ku karker bû di girtina birca "Babîl" de.

Büyîna Bedirxan

Li gundê Şiyê, li herêma Efrînê di sala 1924'an de ji dayika xwe hate jiyanê. Di zaroktiya xwe de koçber bû. Reviya Qiriqxanê û li wir zimanê tirkî ji ber kir û fêr bû. Li Zanîngeha Stenbolê xwendina toreya tirkî jî xelas kir û di ji-yana zimanê fransî de bi xortî kar û xebat kir.

Di salên pênciyan de jî karê rojnamevaniyê di rojnameya Günaydin de li Edeneyê kir.

Bedirxan, bi biyanî nîvîsî. Bi tirkî û fransî; çi helbest û çi çîrok û gotin, di rojnameyan de. Ji ber ku zimanê dayîkê ji wî re qedexe bû. Pişti vegera li gundê xwe Şiyê, di sala 1951'an de bi zimanê erebî jî dest bi helbest û nîvîsandina xwe kir. Di wê demê de karê bi cefa û hêz, jiyanâ wî girtibû û bi awayekî karker bû li bajarê Hema û Humsê. Di sala 1985'an de, bi helbestvanê kurd ê Sovyet re Elî Ebul-Rehman re, hevnamesin li darxist. Ew helbestvanê ku rexne û gotinê xwe bi giranî li ser helbestê Bedirxan dagirtibûn ji ber nîvîsîna wî bi zimanê kurdi. Ev gotinê wiha hatibûn xuyakirin di hevpeyîna Bedirxan de, di kovara El-Hîwar de.

Bedirxan di jiyanâ xwe de ket û rabû, bi perîşanî û xizanî û belengazî, bi zindan û lêdan, jiyanâ xwe û xwendevantiya xwe qedand û di şagirtiya xwe



Hamid Bedirxan

Bedirxan, ji axa û bega û mela û zilm û zordariya wan jî, pir bi kîn bû. Di warê nîvîsîna helbestê xwe de jî mirovekî sosyalîst bû. Her wiha ev tişt jî xuya bû di helbest û dîwanên wî de.

de dest bi xebata xwe ya siyasi kir. Li Tirkîyeyê tevî hevalên doza xwe, helbestvanê mezin Nazım Hikmet û Abidin Dino û Memduh Selîm. Ev hemû helbestvanê hanê, jiyanâ wan hemûyan nêzîkî hev bû. Wekî çawa jiyanê xwe derbas kirin bêzarok, lê ku zaro-kên wan helbest û nîvîsin bûn.

Bedirxan, jiyanâ xwe bi nasîn û xebat û helbestan qedand. Di sala 1994'an de Mihrîcana Helbesta Kurdî ya Duduyan, Bedirxan dawetî mihrîcana kir bi mîvantî. Bedirxan du helbest ji milet re kirin diyarî bi zimanê kurdi. Yek bi navê gundê wî Şiyê bû, ya din jî

bi navê xwe bû, diyarî kir ji canê Cegerxwîn re.

Bedirxan, ji axa û bega û mela û zilm û zordariya wan jî, pir bi kîn bû. Di warê nîvîsîna helbestê xwe de jî mirovekî sosyalîst bû. Her wiha ev tişt jî xuya bû di helbest û dîwanên wî de.

Bedirxan, nîvîsî ji milet re, ji mirovatiyê re, ji pîrekê re, ji Feradê re, ji Asya û Afrika û Amerîkayê re, û ji gundî û dost û hevalên xwe re. Ew dostê Nazım Hikmet bû. Mirovê ku Aragon nasiye bi welatê xwe û dengê xwe gihand hemû aliyan cîhanê.

Bi Pablo Neruda re stran gotin û bi

Lorka re giri û lorand û bi pêşmergeyên cîhanê re çek û tiving hilgirt û bi ma-mosteyê mezin Cegerxwîn re riyan Asyayê raxist û dirust kir û pêlén Çemê Feradê bilind kir, ku Cegerxwîn jê re digot "Deryaya Toreyê".

Bedirxan ji helbestê Cegerxwîn mala evîna xwe girtibû û dîwana xwe ya duduyan jî bi navê helbesteke Cegerxwîn derxistibû; bi navê 'Şeva Hicran' û dîwana wî ya yekemîn jî bi navê 'Li Ser Riyen Asya' hatibû çapkirin.

Ü pişti mirina wî xuya kir ku pirtin 10 dîwanên wî yên ne çapkîrî hene di pirtükxaneya wî de.

Ji gotinêñ Bedirxan

- Helbest qêrîna min
- Helbest dilan paqij dike
- Miletê kurd hunermend e, ji ber ku dîlan û govandan xweş dizane û pê kar dibe.
- Em hewcedarî roman û teatrê ne, pirtirî nanê devê xwe
- Pir gel hene xwediyênek romanîne, lê gelê kurd xwediyê pirtirî 200 roman e.

Nîgarin di meşa mirina Bedirxan de


Di 29'ê avrêla 1996'an de helbestvan Bedirxan di nexweşaneyê de ma Pişti ku nexweşîyeke giran canê wî girtibû û di 2'yê meha 5'an a 1996'an de gundiyan wî keç û xort, pîr û kal li bendê bûn. Zêdetirî 30 hezar mirovî li paslaşê wî rêt girtibûn û bi dirêjiya 3 km'yi ji gund ve bi diljarî mîvan û gundi meşîyan. Wekî şahiyeke mezin hate xuyakirin û sirûda neteweya kurd 'Ey Reqîb' hate xwendin.

Ü gotina destpêkê "Hûn bi xêr hatin" ya xanîma wî Nazîl Xelîl bû, bi zimanê kurdî û helbesta "Şeva Hicran" ya Cegerxwîn hate diyarîkirin ji wî re. Ew jî daxwaza wî bû tev helbestek ji helbestê wî bi navê "Ez serbilind im di nav hevalên xwe de" û pişti wê pêçandina laşê wî, bi ala rengîn gora xwe girt.

Di dema naştina wî de gelek kesen navdar, helbestvan, rewşenbir, weşanvan, rojnamevan beşdar bûn. Her wiha Necah El Ettar (Wezîra Çandê ya Sûrî), Wîsal Ferha (Sereka Giştî ya Komünîstan), Henna Mîna (Roman-nîvîsî erebî mezin) bi telgrafên xwe tevî merasîma naştine bûn. Di dawiyê de gul û reyhan û sosinêni ji ser çiyan gora helbestvan Bedirxan xemilandin.

BERHEVKIRIN: S. ROBARİ

WERGERANDIN: ENYAT



Li Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Stenbolê li Şaxa Beyoğlu'ya û ya İzmîrê vê heftiyê ev çalakîyên çandî, humerî û semîner hene:

● **9.6.1996 Yekşem**

Ji şaxê Navenda Çanda Mezopotamyayê ya İzmîrê Şanoya Hêvî, 'Qêrînên Bêdeng', saet: 14.00, Ji NÇM'ya Stenbolê Konsera Koma Çiya, saet: 18.00

● **12.6.1996 Çarşem**

Semînera Ebûqat Suat Parlar: "Ji Osmaniyan heta îro hêzên dewletê yên nependî", saet: 18.00

● **14.6.1996 În**

Semînera nîvîskarê Abdulmelik Fırat, bi navê "Li Tirkîyeyê fonksiyonên

parlementoyê", saet di 18.00'an de li NÇM'ya Stenbolê

● **15.6.1996 Şemîf**

Sohbeta Ebûqat Zeki Öçal: "Ji kevneşopê ber bi pêşerojê" saet: 14.00, Konsera Ozan Dêlî, saet: 18.00

Li BEKSAV'ê;

● **9.6.1996 Yekşem**

Ji bo xwendekarên zaniñgehan danasîna pişê û besen xwendinê, saet: 11.00

10.6.1996 Duşem

Bîranîn: Nazım Hikmet, amadekar Şükran Kurdakul, saet: 18.00

RÛDAN



Hamid Bedirxan

Ji dîwana "Li ser rîçikîn Asya"*

Ji bo te ey Asya

Ez bazeke Asya me
Ketim rê
Li bin ezman
Û "roja serjêkirî"
Û strana havînê li ser deran,
Ketin û şikestina hêviyan
Pistepistêni di tariyê de
min ranawestînin.

Evîna min ji axê re,
ji mirovan re, ji bayê re,
ji daran re...
Dihêle ez bixebeitim
ji bo bihuştâ qedexe.

Paxir (sıfır) û hesin
birçi bûn
Her tişîten demûşî û pîrhebok
jehra şevan
Bûne zeyt ji çira min re
û pêt hîç venamire
Ji her cihî
dest dikevin destê min.

(Parçeyek ji helbestê)

Mamiş ji gund hat û li bajêr mir

(Parçeyek ji helbestê)


Mamiş rîwiyekî bêveger e
di hişê hevalan de.
Çaxa hate bajêr
ji gundê xwe yê dûr
Rûyekî wî yê nazdar hebû
weki kaniyên ji zîv
Yêl pey xwe hiştin.
(...)
Min careke tenê Mamiş dît
pişt re min pir caran ew dît
Û min bêriya axaftina wî dikir
weki ez rûnim bi "Hanna Minê" re
Û deryayê re
li bin dareke mezin.

Do

ji min re gotin Mamiş mir
Ez pir xemgîn bûm
Ji min re gotin:
berî mirina xwe
Mamiş nas kir çima dîsa êrişî
Angolayê dîkin.

TÎŞK

SÎRWAN REHİM



Şanoy bêdeng

Hunerî Bandomîm, yan şanoy bêdeng, beşêkî zîndûy hunerî şano ye. Bê daxewe hêsta bînerî kurd be tewawî aşnay em hunere be pêz û pir le dahênanê nebuwe. Diyare emeş ewe nageyenêk ême yaxud hunermendanî ême beranber be seng û pêzanîn em hunere kemterxem bûbin, nexêr belkû hewlî be derbest û karî nayab lem biware da berçaw dekewin.. Belam ewende heye ke ew destkurtî hoyekanî rageyandin way kirduve ke ew hunere wekû zor şîti tirî be pêzman le çwarçêwey şarêk yan nawcîyek da bimênetew.

Hunermendî gewrey gelî kurd Ersen Reşîd Polatov ke nizîkey bîst sal berêweber û derhênerî şanoy Yerîvan buwe le Ermenistan, le mer hunerî bandomîm delê; Le katêk da ke wişê nirx û behay xoy le dest dedat, hunerî bandomîm cêgey wişê degrêtewê û ew kelêne pir dekatewe.

Hunerî bandomîm cige lewyey ke rohî palawte û cwankarî şano le xo da berceste dekat û bê hîç arayıştek hunerî resen û cwankarî dexemlînê, herweha rîgeçareyekî lebarîşe bo ewey hunermend bitwanê nazikî hunereke le çeqoy sansorçiyekan rîzgar bikat û cîrgoşey dahênanî goşawgoş ser nebrî.

Hunermende hawçerxekanî cîhan hemîse hewliyan dawe ke sûd le ceste û cûley leş ekter werbigrin, serbarî deng sûd le kare cesteyiyekanî nimayîşkar werbigrin takû lew rîgâyewe hem cwankarî leş le amêzî şano da berceste biken û hem jî rî le ber hegawî sansor qut bikrî.

Ca eger le karêkî şanoyî asayî da, erkî leş le perawêz da bêt, yan ew erke serekiyey nebêt û wişê û riste efsunawiyekan ser çopîkêşî govendî şano bin, ewa le hunerî bandomîm da wişê giringî xoy le dest dedat, yanî şîtek be nawî wişewe le amêz û rûberî şano da niye bînîn û tenanet deng-daneweş her bo ceste û cûley leş degerêtew. Nek çaw belkû giwêş bo tirpey pîyek, bo mişeyek heldexrê, belam karî bandomîm hemû giyan dekat be çaw, çunke kareke karî çawd diwandine û zimanî hawbeşî mirovayetî le xo da dexemlînê. Detwanît biwitît ke le bînîn bandomîm da wişê rolî tewawî xoy le dest dedat.

Hunerî bandomîm hemîse hewêni zorbey ew rîbaz û tewijme tazane buwe ke lem sedey bîsteme da seryan heldawe. Eweta Bertold Brechtî şanokarî gewrey Alman dexwazêt be tenha şêwewestanêkî ekterekanî û bê ewey tek wişeyan le dem bête derewe gewretirîn şit bilên, yanî deyewê bêdeng peywî gewre pêşkeş bikat. Aya eme beşêk le bandomîm niye?

Herweha derhênerî be nawbangî Polonî Krotofskîş hemîse giringî be cestey ekter û cûley leş dedat, emîş deyewê zorbey erkekanî nimayîş le leşî nimayîşkar da kokatewe, belam bew merçey ke lew perî bedewî da cêgey wişâ bîgrêtew. Krotofskîş dexwazê ekter bê ewey peyvêk le zarî bête derewe şitekanî xoy be bîner bigeyenê. Diyar e ke emeşyan her ger-aneweye bo hunerî bandomîm.

Şanoy bêdeng pêwîstiyeke gewre û girane û debê giringî tewawî pêbîdrê, be corêk ke ew hunere be bînerî kurd binasenrê.. Be hîway ew rojey gelî kurd le ser şanokanî kurdistan aşnay em hunere hawçerxe debet....

Hevalêna lûye û şêr

Waxtê gome de şêr û lûye ra piya heval benê. Şêr kî hîre leyirê xo benê. Na heval her dem têlewe de fetelîne û qe zumun ra nevisînê.

Rozê (rojê) lûye şêr ra vana:

– Bê ma piya na koy sero bifetelîme (bigeyrim), hala ci esto ci çino.

Şêr û lûye ra kunê raye Sonê. Xelê fetelîne (geyrenê) û yenê çengelê de girs ser. Vereniya çengel de tiro de zof girs beno û dey vera kî çengelo de bîbeno. Arê na hurd çengelû nejdiye hîrê (hûrê) mêtre beno.

Hurd heval tenê nîsenê ro û oreşinê ra. O dem de lûye wirzenera û şêr ra vana:

– Piyê to henke çêr bî, na çengel ra xildenê çengelê bovîr ser. Nika keso jêdey çîno.

Nafa şêr kuno xo ver, vano:



– Ma piyê mi itara xildano ez beseñenê çawo. Ezo xildan.

Çi esto ke neşkîno xo bover erzo û

tira erjîno sono (sono). Lûye xo de be-na sa eve rîwayis sona lewê şêr. Hetê ling û ser sona fek kena ci, cêra vena.

Şêr şaş kune û lûye de nadano vano:

– Heval ti senê hevala mi wena. Qey mi nêxelesnena ama lingunê mira mi kîsena (kişena). Eke henyo cigerunê mi burê kî çimê mi va rakarde nêşerê, ez vajine hevala mi ez werdo.

Lûye kî vana:

– Mi piyê to xapit ard, ita (tiya) eve na qeyde kîşt û werd. Nafa kî to xapita. To ra dime kî leyîrunê to xapnen onça an ita eve na qeyde wen.

O dem de nadanê vengê bervîs yeno. Lûye sarê xodana we nadana leyîrê şêr amê çengel ser bervenê. Cerenê ra lûye ra vanê:

– To kalîkê ma xapit ard ita kîşt werd, piyê ma kî eve na to rê wena. Hama endî neşkîna ma burê. Na ra dime ma nêxapîme.

ŞENGUL

Kêz Xatûn

**“Kêzê kêzê kêz xatûnê. Tu bi şimikên
reqreqûnê, ji gulan gulan bixwînî.
Tu bi ku de diherî?” Kêz Xatûn bersiv dide:
“Ez dê ji xwe re mîr bikim”**

Hebû tune bû, carek ji caran, rehmet li dê û bavê guhdaran. Xêr ji eza û mixtaran. Gotin ji me, dotin ji we. Li gundekî keçikek dijî. Salên wê êdî bi-hurîbûn. A rastî di mal de mabû. Tu kesî ew nedixwest û pê re nedizewicî.

Rojekê bêhna wê teng dibe. Hêz di-de xwe radibe piyan. Dibêje:

– De bi ci rengî be, ezê ji xwe re mîr bikim (bizewicim).

Kete û helawê xwe dixe tûrikê xwe, serî hildide, bi çiyan dikeve. Pir dihere, hindik dihere, rastî şivanekî tê. Şivan ji dûr ve bang dike, dibêje:

– Kêzê kêzê kêz xatûnê. Tu bi şimikên reqreqûnê, ji gulan gulan bixwînî.

Tu bi ku de diherî?

– Ez dê ji xwe re mîr bikim.

– Tu min nagirî?

– Bersiva min rast bide. Em bêjin min tu girfî. Dema ku di mal de bêhna te teng bû, tu hêrs bûyi, tu wê bi ci per-galî, bi ci darî li min bixî?

– Bi çoyê (darê) şivanîyê...

– De her qeşmerê kislan. Ne hewce-yê te me.

Kêz Xatûn ji hêrsan merezarî dibe û dîsa bi rê dikeve. Di riyan de rastî ga-vanan, berxvanan, nêçîrvanan û hwd. tê. Hemû bi awayê (wekî) şivan bang lê dikin. Ü hemû bersiva wê didin. Yek dibêje bi çoyê gavaniyê, yek dibêje bi çoyê berxvaniyê, yê din dibêje bi dare-

ke din wê lê bixin.

Kes ji ji çoyan berjêr nayê xwarê. Kêz Xatûn ji, ji wan hemûyan re çêran dike û dikeve riya xwe. Lê, êdi tarî lê diqewime. Şev di ser de tê. Bi morale-ke xerab hildikişe ser darekê û radike-ve.

Di destê sibê re dibîne dûyekî zirav ji dûr ve bilind dibe. Xwe li benda wî dûyî digire û dimeşe. Rast li koşka mîr tê.

Dihere ber deriyê mîr li ser kevirê xwezgîniyê rûdine. Li ber deriyê mîr du heb kevir hebûne. Yek ji bo par-sekan û yê din ji bo xwezgîniyê, mîr diheyire. Ferman dide û wê derdixe hi-zûra xwe:

– Ma tu dîn ? Ew kevir ne yê par-sekan e. Tu keçikek bi serê xwe yî, ci di-xwazî?

– Ez dixwazim mîr bikim.

– Tu min nagirî?

– Bersiva min bide. Tu wê bi ci çoyî li min bixî?


Mîr sûr ji ber xwe dikişîne û dibêje:

– Ezê bi sûr li te bixim.

– De her pîso. Ev sûr qet nebe. Ez ne hewcîyê te me.

Kêz Xatûn di dinyayê de mîrekî bêço nabîne û di dawiyê de bi mişk re dizewice. Sedema ku mişk wê bi boçe-ka xwe lê bixe. Ü boçik jî mirov naêşîne.

MENDO MOBAR



Hades tim li ser kar in

Tu rewşenbîrekî kurd ê binamûs ji tehde, işkence û sirgûnê nefilitiye. Digel vê, jiyanekê derbeder jî, jiyaye.

Di nav me kurdan de "rewşenbîrbûn" zor dijwar e. Ji aliyekê ve berpirsi û peywirênu ku civakê lê bar kirine û ji aliye din ve jî roma reş, ereb û ecem.

Hz. Ali, li gorî gotinbêjan, gotiye "Kî herfekê hînî min bike, ez dê cil salî bibim koleyê wî." De içar rewşenbîrekî kurd, Dilşad Meriwanî, li başûrê welêt xwestibû ku tipen kurdî yê latînî, hînî şagirtên xwe bike, ji aliye rejîma Saddam ve hatibû idamkirin. Bi ya min, ev serpêhatî têra xwe rewşa ronakbîren kurdan eşkere û zelal dike.

Tu rewşenbîrekî kurd ê xiretdar û binamûs ji pest, pêkufti, tehde, işkence, girtin û sirgûnê nefilitiye. Digel vê, jiyanekê derbeder jî, jiyaye. Ha li vir û ha li wir bûye. İcar kesen ku bi weşankariyê re eleqedar bûne, tim di bin cerd, êris û pêkutuya polisan de bûne û weşanxaneyê wan hatîne talankirin. Ev rewş hîna jî berdewam e, tu tişt neguheriye. Ewletiya tu weşanxane, rojname,

kovarênu kurdan nîn e. Li benda polis in, ka dê kengê bêñ.

Medenî Ferho jî, yek ji wan rewşenbir û weşankaran e ku niha li derveyî welêt dijî. Van rojan romanekî wî bi tirkî hate weşandin. Navê romanê "Hades İş Başında" ye û ji aliye Weşanen Kora ve hatîye weşandin. Roman ji 283 rûpelan pêk tê. Mirov dikare wiha li kurmancı wergerîne:



"Hades li ser kar e". Nivîskar di vê romana xwe de rewşa ronakbîr û weşankarênu kurd tip tazî li ber çavênu xwendevanan radice.

Medenî Ferho, beriya derbeya 12'ê rezberê li Stenbolê weşanen ABeCe'yê ava kiribû û ji derbeya leşkerî jî para xwe standibû. 7 sal di hundir de mabû. Beriya ku wî biavêjin girtigehê jî, 45 rojan di "binçav" de dihêlin. Aha ev roman berhemâ wê girtîtiya dirêj e.

Nivîskar di romanê de, li ser xwe, li ser wan bûyerên ku hatîne serê wî, radiweste û wê heynê careke din bi xwendevanan dide jiyandin. Ferho, bi awayê vegotina xweserî xwe, wê demê vedi-beje. Car caran bi rîbaza sur-realist jî demê hildide destê xwe. Di romanê de tiştekî girîng jî ev e; digel nixandinê, hesab pirsin, darizin (muhabame) jî heye. Gerék e em balê bikişînin ser taybetiyeke Medenî Ferho jî. Ew hem bi kurdî û hem jî bi tirkî dinivise. Hem bi pexşanê û hem jî bi helbestê re eleqedar dibe.

M. RONAK
Navnîşan: Weşanen Kora
Cağaloğlu Yokuşu Evren Han
Kat:3 No.55
Cağaloğlu / İstanbul

wan, tu rûyê wan radimûsî, ew jî di rûyê te de diqîşirin û hêrs dibin: "Biceheme! Biçe welatê xwe, ev der welatê me ye. Me bi ked ú xwê-dana eniya xwe ava kiriye. Derkeve..! Heqê te tune ye tu nanê me bixwî û ava me vexwî! Tu jiyana me gemarı bikî..."

Li vê derî jiyani ji mirov re dibe wekî gogekî ji berfê, bi tînekî re dihele, winda dibe, şopa wê jî namîne. Belkî ew bikaribin min wekî hevîrekî di desten xwe de bibin û binin, lê belê tu caran nikarin li gorî dilê xwe ji wî hevîri nanekî çebikin. Niha di van kolanan de, navekî din li min dikan: PENABER. Cara yekemîn li vê derê min ev nav bihîst, tevî ku ez li gundê xwe penaber bûm jî, lê belê navê min her navê berê bû, kesekî cesaret nedikir ku bi navê min bilîze. Niha jî, min zarokên xwe xistine nava çiwahekî û ez wan tî û birçî li kilise û saziyên mafêni mirovan digerînim, ji wan re li mafê rûniştinê digerim. Kî dizane di vî dilî de çend axîn û çend birîn hene..!

Hîna jî ez nehatime naskîrin, ne Yekîtiya Neteweyan, ne jî "komeleyen mafêni mirovan" nikarin û naxwazin min nas bikin. Êdî wê ew jî min li ber deriyê xwe nebîn.

Werin û Bibînin..! Bi hezaran salan min navê xwe parast. min dev ji her tiştî berda, mala min hate şewitandin, jina min ji dest min girtin û di zikê wê de bi sungîyan zarokên min kuştin... lê dîsa ji nikaribûn hînek tiştan ji minibîşînin, û min lekeyeke gemarı li eniya xwe nexist. Hînek min nas nakin, hînek min nas dikan, lê belê navê min şaş dixwînir. Hînek dema ku navê min dibihîzin, guhîn xwe digirin û hînek jî dixwazin bînîn bîra xwe ez kî me, difikirin.

Carekê ez şaş bûm û min devê çiwalê ku zarokên min tê de bûn vekir. Diranen wan zer bûbû. Di çavênu wan de ronahî zeif bûbû. Diîe wan wekî gulên tî cilmissi bûn. Guhîn wan giran bûbûn û dengê kesekî nedibîhhîstîn,

HELWEST

Kovara Çand û Edebiyata Kurdi

RONESANSA KURDİ

De İremadur Korkut Sivrihan Kardeş	Sabah B. Soreklî	İsmail Duman	Necip H. Küçük
Zülfü Livaneli	Şenol Gürkan	İbrahim Polat	Zülfü Livaneli
Levent Polat	Zülfü Livaneli	Lütfi Öztürk	Zülfü Livaneli
Zülfü Livaneli	Zülfü Livaneli	N. Zaxuranî	Zülfü Livaneli
İsmail Sırrı	Süreyya Adil Duran	İsmail Demir	İsmail Demir
Süreyya Adil Duran	Süreyya Adil Duran	Süreyya Adil Duran	Süreyya Adil Duran

DİMENEK JI RONAKBİRYA KURDİ

Hejmer / No: 4 - Sal : Heziran - 1996

Helwest xwe nû dike

Kovara Helwestê bi hejmara xwe ya 4'an derkete pêşberi xwendavanen xwe. Kovara ku li Swêdê dertê û xwerû bi kurdî

ye, di vê hejmara xwe ya dawî de li ser "Ronesansa Kurdi" rawestiyaye û ev mijar ji xwe re kiriye manşet.

Ji hêla din ve di kovarê de hatîye eşkerekirin ku wê kovar naveroka xwe biguherîne û hejmara 5'an dê wekî kovareke akademîk a çand û edebiyata kurdî derkeve. Her wiha, kovarê redaksiyona xwe jî fireh kiriye û tê daxuyandin ku dê ev yek wê hîn pirtir berfireh bibe.


Di vê hejmare de nivîs, gotar, hevpeyîn, danasîn û analîza berheman cih digirin. Ji wan hin jê ev in:

"Ronesansa kurdi di ci merhaleyê de he ye?" Lokman Polat (birêveberê kovarê ye), "Dîmenek ji Ronakbîrya Kurdi" A. Gernas, "Tevgera Rizgarîxwaz û Rewşenbîr" N. Zaxuranî, "Nivîskar Çima Pêwistî Bersiva Hînek Tiştan e?" Medenî Ferho, "Ziman, Zarav û Pirsine Din" Şahînê. B. Soreklî, "Miho" (kurteçîrok e) Suleyman Demir.

Ü hevpeyînên bi Latif Özdemir, Gabar Çiyan û Zana Farqînî re

Hemû guneh ji min standin û gotin 'Were tobe bike'

DILBİXWÎN DARA



Werin û Bibînin...! Navê filmekî rûşî ye, jiyana zarokekî rûş di şer de tîne pêş çavênu temâşevanah. Lî belê, ne di ekranen televîzyonan de, ne jî li ser perdeyên sînemayan yê spî... werin rastiyen bibînin: ne tenê jiyana zarokekî, dramaya hemû zarokên min bibînin. Cesaret bikin û çavênu xwe negirin, hînekî xwe bişşînin, xem nake bila ji çavênu we xwîn bibare, ji ber ku zarokên min di nava xwînê de gelek caran fetisîn.

Dema ku "însan" însanan dixwin!

Ji dinyayekê ez diçim dinyayekê din. Tu caran min nedixwest ez pişta xwe bidim wan gundan û li kolanen Ewrûpayê wekî pêxwas û birçiyekî desten xwe li ber rîwiyan vegirîm û ji wan rica û lavan bikim, qet nedihate bîra min. Tu caran min nedixwest navekî xerîb li min bikin û bi navê min ê ku diya min li min kiribû, bikenin. Tu caran min bawer nedikir ku ezê rojekê ji rojan mala xwe biavêjîm ser pişta xwe û wekî koçerekî li stasyonen van welatan, bigerim û wekî dizekî xwê di koşeyen fargonan de veşîrim. Li vê derî mezgeft jî nîn in ku ez xwe li ber menbera wan biparêzim.

Tu caran nedihate ber çavênu min ku dîtina çem, rûbar, dar û ber, sura bayê sibehê û dengê dîkan di berbangê de wê di dilê miş de bibin hesret. Li van deran tu nizanî roj ji kîjan alî ve tê der. Li van deran tu nikarî ji însanan hez bikî, ji te hez nakin, naxwazin navê te bibihîzin. Li van deran tu xwe diavêji hembêza

wan, tu rûyê wan radimûsî, ew jî di rûyê te de diqîşirin û hêrs dibin: "Biceheme! Biçe welatê xwe, ev der welatê me ye. Me bi ked ú xwê-dana eniya xwe ava kiriye. Derkeve..! Heqê te tune ye tu nanê me bixwî û ava me vexwî! Tu jiyana me gemarı bikî..."

Li vê derî jiyani ji mirov re dibe wekî gogekî ji berfê, bi tînekî re dihele, winda dibe, şopa wê jî namîne. Belkî ew bikaribin min wekî hevîrekî di desten xwe de bibin û binin, lê belê tu caran nikarin li gorî dilê xwe ji wî hevîri nanekî çebikin. Niha di van kolanan de, navekî din li min dikan: PENABER. Cara yekemîn li vê derê min ev nav bihîst, tevî ku ez li gundê xwe penaber bûm jî, lê belê navê min her navê berê bû, kesekî cesaret nedikir ku bi navê min bilîze. Niha jî, min zarokên xwe xistine nava çiwahekî û ez wan tî û birçî li kilise û saziyên mafêni mirovan digerînim, ji wan re li mafê rûniştinê digerim. Kî dizane di vî dilî de çend axîn û çend birîn hene..!

Hîna jî ez nehatime naskîrin, ne Yekîtiya Neteweyan, ne jî "komeleyen mafêni mirovan" nikarin û naxwazin min nas bikin. Êdî wê ew jî min li ber deriyê xwe nebîn.

Werin û Bibînin..! Bi hezaran salan min navê xwe parast. min dev ji her tiştî berda, mala min hate şewitandin, jina min ji dest min girtin û di zikê wê de bi sungîyan zarokên min kuştin... lê dîsa ji nikaribûn hînek tiştan ji minibîşînin, û min lekeyeke gemarı li eniya xwe nexist. Hînek min nas nakin, hînek min nas dikan, lê belê navê min şaş dixwînir. Hînek dema ku navê min dibihîzin, guhîn xwe digirin û hînek jî dixwazin bînîn bîra xwe ez kî me, difikirin.

Carekê ez şaş bûm û min devê çiwalê ku zarokên min tê de bûn vekir. Diranen wan zer bûbû. Di çavênu wan de ronahî zeif bûbû. Diîe wan wekî gulên tî cilmissi bûn. Guhîn wan giran bûbûn û dengê kesekî nedibîhhîstîn,

nedixwestin li însanan guhdarî bikin, ji ber ku însanan ew di wan ciwalan de ji rojê mehrûm kiribû. Belê min nedixwest ez zarokên xwe di wan ciwalan de bifetişînim, ji ber ku ew bîguneh bûn, bi xwîna kesekî çavênu xwe sor nekiribûn, wekî ku niha hînek kes çavênu xwe bi xwîna me sor dikin. Belkî tenê gunehê wan ew bû ku xwe avetibûne ber zincirên panzeran ji bo ku şîlla li ber deriyê xwe biparêzin... Belê, bêtara ku bavê min anîbû serê min, min nedixwest ez bînim serê zarokên xwe.

Di dinyayekê wisa de ku kesek ji te hez nake, wê tu çawa bikarîbî hezkirinê tarîf bikî? Wê tu çawa bi hezkirinê bihesi? Çirokên ku dapîra min ji min re digotin û wêneyen ku min di pirtûkan de didîtin û bûyerên ku ez niha dibînim, geleki ji hev cuda ne. Li gundê me, xeyal ji rastiyen şîrtîn bûn, li vê derî rastî ji bûne derew. Wekî ku her tiştî bi derewan hatîbîn çekirin.

Zarokên min dixwazin hîn bibin: Ev kesen ku em ji mecbûrî nav li wan dikin însan, ji min ci dixwazin? Hemû guneh ji min standin û gotin were tobe bike. Pişta min şikandin û xwestin ku ez ji Xweda re biçim secdeye. Zimanê min qut kirin û gotin "Were ji me re stranan bibê... bi dengekî zelal ayetan bîxwîne."

Çavênu min rijandin û ji min xwestin ku ez di nîva rojê de ji wan re bijmîrim, di van heft ezmanan de çend stêrk hene? Jiyana xwe ji dest min girtin û gotin "Were ji me re bibêje, mirov çawa dikare xwe ji mirinê biparêze... jiyan çiqas xweş e?" Ü dema ku xwestin zarokên min bikujin, ez wê demê bi jiyanê hesiyam. Êdî, ji her demê bêhtir ezê niha bikaribim, dersen jiyanê ji zarokên xwe re bîxwînim. Li niha û şûn ve hezkirin dest pê dike. Belê, ez di çavênu zarokên xwe de hêvî û hezkirineke ku em berê pê nehésiyabûn, dîbînim...

Meleyê tirk û şûştina miriyan

Rojekê meleyekî ji imam-xetîbê (meleyekî tirk) terxanî (tayîn) gundekî Kurdistanê dîkin.

Demeke dirêj derbas dibe, çend mirov diçin rehmeta Xwedê. Wexta gundi mirî tînin bişo,. Mele dibêje: "Mirî deynin vê derê, nîv saêtê şûnde werin binêrin." Lî belê gundi meraq dîkin. Dibêjin gelo mele çawa miriyan diço. Rojekê gundiye k xwe dixe şûna miryekî. Wexta gundi mirî tînin, mele dibêje, "deynin vê derê û herin nîv saêtî şûnde werin, binêrin." Mele mirî dibe dixe odayekê, deriyê odayê kîlît dike, dixe serşokê (kuved), lê wexta mele mirî diço, mirî radibe.

Mele serê mirî dixe nav avê, mirî dikuje pê firecê diço û derdixe. Bangî gundiyan dike, gundi mirî dibin. Metel dimînin, dibêjin gelo mele zehf di riya Xwedê de ye. Me lê henek kir, bi rastî mir. Di navberê de çend meh derbas dibin. Rojekê mele roja ïnê li mizgeftê waazê dide. Bi tirkî dibêje:

—Gelî bawermendên hêja, wexta hûn miriyêñ xwe tînin, baş mîze bikin bila tam bimirin, paşê bînin.

ZEKÎ BAZIDÎ



Kerameta Şêx

Sêx Beşîr, ji mirîdên xwe re gotibû, li odaya mîvanan çend cure doşekan raxin. Bila rengê wan ji hev cuda be.

Yê ku karekî bi xwe re bîne li ser doşeka zer, yê ku berxekî bîne li ser doşeka kesk, yê bizinê bîne li ya spî, yê ku mehekê bîne li ser ya sor, yê ku dewarekê bîne, li doşeka reş bidin rûniştandin.

Dema ku mîvanen şêx dihatin û bi cih dibûn, şêx diçû yek bi yek bi xîrhatin dida û digot:

—Hey Xwedê jê razî, ci hewce bû, te ji bo ci ew kar anî. Te ji zarokên xwe re serjê bikira baştar nedî-

bû?

Şêx ev pirs li gorî rengê doşekê diguhert.

Dema ku mîvan diçûn gundê xwe, digotin:

—Sedeqe ji navê Xwedê re. Wey wey, ma şêx me ci qutbekî ezim e. Her tişt jê re xuya ye. Yek bi yek derxist ku, kî ci sewal jê re biriye. Dema em çûne meqama wî ew nependî me bû. Fersend jî nedît ku ji kesî bipirse, ka kî ci xelat jê re anîye jî.

Ev kerameta Şêx Beşîr li wê herêmê tev de belav bûbû...

HESEN ZINAR

Emirlerinize hazırım komutanım!

Li Mêrdînê navçeya Mehserê gundê Bêrtê mirovek hebû. Navê wî Apê Osman bû. Pêncî salî bû. Rojekê tê bajêr tiştan dikire û li dolmîşê siwar dibe, diçe gundê xwe.

Di rê de leşker nasnameyan kontrol dîkin û dolmîşa ku Apê Osman jî pê çûbû disekekinin.


Apê Osman peya dibe, dimeyzîne ku nasnameya wî ne di berîka wî de ye. Kumandar diçe ba Apê Osman û nasmeya wî jê dixwaze. Apê Osman dinîre ku xelasî tune ye. Dikeve amadehiyê (hezrolê), konyeya xwe ya leşkerî dibêje û tekmiî dide kumandar: "Emirlerinize hazırlım komutanım!"

Ji ber vê yekê kumandar Apê Osman maçı dike û dibêje: "Aferin ji te re Apo, hîna te tirklixa xwe ji bîr nekiriye. De li dolmîşê siwar bibin û herin."

M. SALIH AÇIKGÖZ

XELAT...

XACEPIRSA BIXELAT (21)





Bersiva Xacepirse (19)

Xacepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin.

Xelata hejmara me ya 21'an kitêba Musa Anter "Firat Marmara'ya akar"e

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di navâ qutiyêñ li bin xacepirse de binivîsin û tevî adresâ xwe ji me re bişînin.

Kesên ku xelata xacepirsa 19'an, kitêba Gabar Çiyan "Tarihte Kürd sürgünleri" qezenc kirine: Bahatin/Stenbol, M. Kandemir/G. Antep, Münir Döger/Silvan, Emin Köklü/Seyhan, Hüseyin Fidanboy/Stenbol, Harbi Soylu/Bartın, Dilan Selçuk/Hatay, M. Emin Toprak/Ceyhan, M. Zekiriya Alın/Beşiri, Güler Arkadaş/Mersin.



1 2 3 4 5 6

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayincılık

San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpîrsê Karêن
Nivisaran
(Yazi İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELEDER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX
(0 212) 293 53 19,
251 90 13
ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
Birleşik Basın Dağıtım
(BBD)

NÜNERİTYİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Berlin: Silêman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Selîm Biçük
49-5721-81360
Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Atina: Ferhan Zêbarî
30-13634905
Bruksel: Medenî Ferho
32-02-466037
Stockholm:
Robin Rewsen
46-8-7510564

Badenwurtenberg:
A. Rahim Ayaz
49 75 45 91 10 42
Bonn: Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda: Remzi İlhan
312 06 32 31 28
Celle: Wezir Saçık
49 50 52 87 36



Hunerê dewleta tirk

Em ser 10 seryo welatê ma di jew şero qilêrin (limin) dom keno. No şero qilêrin ra ne feydeyê miletê tirk est o, ne jî (zî) feydeyê miletê kurd est o. No şero qilêrin di, heris hezar esker, gerîla û sivîl merdê. Çar hezar dewî veşayî û biye vengî. Domanî (qeçekî) seykur mendî, cenî viyay mendî. Jew raşte miletê tirk û kurd est ê. Hendayî merdimî marde, hendayî dewî veşayê, hendeyî milet weletê xo ra sirgûn biyê. Hewna milet niya qilayê nê şer di qilêrinî.

Dewleta tirk û dewletê emperyalistî nê şerî milet ra nimnenê. Tim û tim tevay anê milet ver. Qandê joy milet veng nekena. Milet ra vanê:

"Dewletê ki çimê ci herda ma di estê, ê vazenê dewleta ma birjinê. Eger mayi nêwazami, nê dewleta ma birjinê, ma pêro jew bimi. Ma jew mebimi se, nê dewleta ma rîjenenê."

Miletê tirk jî zaf neteweperest a. Senî ki vanê niyê dewleta ma birjinê, hema yênen pêser, benê jew. No şero qilêrinî bê faqiri, bê gunî, bê hesran dê çiman teva nedawo milet.

Şer vatişti, qanûnê şerî est o. Nê kiştî gerek eskeran di pêjewînana şer bikirê. La balê mayê ew ro evnemi dewleta tirk, qanûn dê şerî di şer nekena; sivilan kişena, dewan veşnena û kena veng; koyan bombe kena

Şer vatişti, qanûnê şerî est o. Nê kiştî gerek eskeran di pêjewînana şer bikirê. La balê mayê ew ro evnemi dewleta tirk, qanûn dê şerî di şer nekena; sivilan kişena, dewan veşnena û kena veng; koyan bombe kena

kena. La balê PKK vina nêkeno; qanûndê şerî di şer keno. Eskeranê dewleta tirk tepişenê, rind ewnenê ci muameleyî hesir kenê, eskeran nêkişenê. Dewleta tirk se gerîlayan tepişenê kişenê, şasetû kenê; seron, goşon û pirnikonê dinê birnenê. Ê kê çekenê zîndanan se ïnan ra jî şasetû kenê. Ol wazanê xo rê xeyîney bikerê. Yanê muameley hesir nêkenê.

Wara dima vejêna, vana: "Ez demokrat a." Tenya niyê? Bêguman ki nê niyê. Devon veşnena, doman kişnena, cenîyan dê ma ra, wayan dê ma ra tecawîz kenê, çekenê PKK'ê ser. Milet jî emel bena. Ci ra emel bena? Nînan winî weş kena ki, milet jî emel kena.

Çinayonê gerîlayan dana tîmandê taybetiyan û çahşan rîseña dewon. Nê jî dewon di milet kenê tever; cenîyan kenê jû kiş; camerdan kenê jû kiş. Camerdan het cenîyan kenê vit û viran. Camerdî vengê xo vejenê se hama kişenê, yan jî şasetû kenê. Bado dewon danê adir, kewnê dûrî. Hema eskerî yenê, veyn danê televîzyonan û rojnameyan benê nê dewon. Nê televîzyonan û

rojnamey êkê kişa dewletê ïnan benê. Ê bînan nê benê. Milet jî vana qayê nînan PKK'ê keno. Çimki winî weş kardi ki cina-yê gerîlayan danê xo ra, kurmancî/ kirmancî qisey kenê, vanê "Ma PKK'yî me, mayî qandê Kurdistanê têkoşîn damo." Milet jî rind nêzanayî, emel biyê. Vatê qayê nînan PKK keno.

Qandê joya ew ro zey verî niyo. Ew ro senî ki tavayê winaynîn beno se, miletê zanê kamo keno. 15 rîbendan di na kiş, Şîrnex di û Meraş di zey verî kerd. Milet hema aqîlyay ci. Zana nê kamî kerdo. Şîrnex di 11 qoricî girotî binçim. Bado nê kerde ju dolmuş miyon, 3 teney eskerî kerde het, rişti dewon di ci. Raydi ne 11 mardimî veşnayî û hema televîzyonî bardî nê anti televîzyonan. Hetanî şon nê musnay û va: "PKK'ê agîrbest qedîna, 11 qoricî veşnay."

PKK, hema şîlan kerd, va: "Ma nêkerd, dewleta tirk nê merdimî veşnayî, adîrbestê ma dom keno.

Mayê jî wazamî dewleta tirk nê provakasyonan virado, veng bido nê vengî.

MEMET DIREWS

Bişar!

Mêrxas...

Me tu ji çiya pirsî

Got bi hîva şevê re li vir e

Me tu ji keleşê pirsî

Got ev deh sal e, bi min re

Me tu ji gundiyan pirsî


Gotin Bişarê Çûr li hemberî neyar e

Me tu ji hevalan pirsî

Gotin ew sirûd e, rihê wî bi me re.

Sıraç Aksoy

**Stêrek
xuricî,
yek çû û
yek jî hat**




Bişar (Cemil Duman)

eta ruh di kurdan de hebe, wê girtiyên xwe biparêzin

Êrîşen hovane birin ser girtiyên ku di greva birçibûnê de bûn, ew birîndar kirin, vêga li ber mirinê ne. Ji me re dibêjin teror, em ne teror in, teror ew bi xwe ne! Yênu ku gundan dişewitînin, gundan vala dikan, daristanan dişewitînin teror in!..

dema mirov dikeve avahiyê, hêj li jêr li ser nêrdewanê dengê stranên govendê tê guhê mirov. Kesê ku nizabibe, wê bibêje li jor şahiyeke mezin heye, govendeke ges digere... Û bi rastî jî li jor govendeke ges digeriya, di nav şahiyeke mezin de, dengê ken û stranan tevî hev dibûn. Ku mirov li çar aliyan dîwêr sloganê wekî "Me zarokên xwe ne ji bo ku hûn biku-jin anîne dînyayê!", "Dixwazin Talat Türkoğlu winda bikin!" nedîtina, ji reng û rûyê wan, ji kêt û şahiye wan, rabûn û rûniştina wan, mirov bi tu awayî tê dernedixist ku ev însan bi rojan e xwarinê naxwin. Wekî hemû kesî, belkî ji zêdetir stran distrêن, dikenin, go-vendê digerîn...

Çawa di destê me de makîne dibînin, zarok destê xwe bilind dikan, bi tiliyên xwe yên bicûk işareta serkeftinê çedikin. Her wisa jin ji tiliyên xwe radikin. Hinek zarokên ku bi ecêbmayı li me dinêrin û tiliyên xwe ranakin bi dengê pîrejinekê "Tiliyên xwe rakin!"



vediciniqin û bi lez destê xwe hildidin...

Piştî ku Mehmet Ağar bû wezirê edaletê, li zîndanan, di nav girtiyan de nerihetî çebûn. Roj bi roj mafêñ girtiyan ji destê wan hatin standin û girtî mecbûr man ku li dijî êrîşen idareye dest bi greva birçibûnê bikin. Greva birçibûnê li Girtigeha Diyarbekirê dest pê kir û li hemû girtigehan belav bû. Li derive ji malbatêñ girtiyan li Diyarbekir, İzmir, Bursa, İskenderun, Edene, Stenbol û Semsûrê wekî zarokên xwe ketin greva birçibûnê.

Li navçeya bajarê Stenbolê Bahçeli-evlerê ji malbatêñ girtiyan ev 19 roj in

ku bi dorvegerî greva birçibûnê didomînin. Piraniya wan jin in. Firdews Şimşek jî pîrejineke 70 salî ye, dema em sebebêñ destpêkirina wê ya grevê dipirsin, ew bi pirsekê bersiva me dide:

"Ez pîrejinek im, nexweş im, piyê min seqet e, li vî bajarî ci digerim? Ji min ci xwestin, bo ci ez mecbûrî vî bajarî kirim?.."

Piştî van gotinêñ xwe bi kul û kederke giran "Ez û vî bajarî, ez û hewa wê, barana wê, ez û tu tiştê wê em li hev nakin!.. Min dixwest ku dawiya emrê xwe li gundê xwe, li ser axa xwe derbas bikim, piştî jiyanê li goristana ku dê û bavê min lê radizin bibim mîvan, nehiştin! Nahêlin, xezeb li wan bîbare!.." dibêje.

Hêj Firdews Şimşek gotina xwe neqedandiye, pîrejineke din, bêteklîf û bîhêrs dest bi axaftinê dide:

"Ji deh hezaran zêdetir girtiyên me, bêçek û sîleh, di destê wan de ne, êrîş dîbin ser van mirovên bêçek û mefer. Ew heqêñ ku bi canê xwe, bi xwîna xwe standine, dixwazin ji destê wan derxin. Ew xwe, şeref û namûsa xwe bi canê xwe diparêzin. Em jî li vir wê bi canê xwe wan biparêzin... Daxwazên wan ên herî însanî bi mirinê dibersivînin. Çûne serekê îşkencevan kirine wezirê edaletê. Heta daxwazên zarokên me qebûl nekin, em dev ji grevê bernadin. Heta ruh di canê kurdan de hebe, wê girtiyên xwe biparêzin... Meqseda wan, tunekirina me ye, dixwazin me qir

bikin... Dibêjin em misilman in, lê diçin bi îsraîlî re dibin yek, êrîş dîbin ser misilmanan..."

Bi gotina wê ya dawiyê re, Wesile Aydemir dest pê dike. 60 salî ye, kurê wê girtî ye û bi qasî şewata dilê xwe bîhêrs e, "Li Kibrîse 170 hezar tirk hene dewleta wan heye, em bi milyonan in yê me tune; em jî dixwazin ji xwe re cumhûriyetekê ava bikin..." dibêje û bi eynî hêrsî li gotina xwe zêde dike:

"Êrîşen hovane birin ser girtiyên ku di greva birçibûnê de bûn, ew birîndar kirin, vêga li ber mirinê ne. Ji me re dibêjin teror, em ne teror in, teror ew bi xwe ne! Yênu ku gundan dişewitînin, gundan vala dikan, daristanan dişewitînin teror in!.. Teror Mehmet Ağar e!..."

Xanim Alkan bi gotinekê bersiva me dide:

"Êdî bes e, ma ew jî xwînê têr na-bin!.."

Em ji jineke din dipirsin, lê me dibe odayeke vala, hêj bersiva me dide, naxwaze navê wê eşkere bibe. Mêrê wê girtine bi îşkenceyê kirine itirafkar, lê sih roj berê ketiye greva birçibûnê ku wî ji nav itirafkaran derxin.

Li ser mîrê xwe ev gotin zêde dike:

"Dema ew li emniyetê girtibû, ez ji girtim, birin balê. Min li ber polisan jê re wiha got: "Heke tu bixwazî ku em te efû bikin, ji vê riyê vegere. Heta tu neçî nav hevalan, heval te efû nekin, em jî te efû nakin!.."

RAHMI BATUR